

KT
ZANÎNGEHA MARDÎN ARTUKLUYÊ
ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKIYEYÊ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Ê ÇANDA KURDÎ
TEZA LÎSANS A BILIND

DENGSAZIYA DEVOKA ÇALDIRANÊ

Çetin TAŞ
11711012

Şewirmendê Tezê
Doç. Dr. Abdurahman ADAK

Mêrdîn 2015

KURTE

Di vê xebatê de me li ser devoka Çaldiranê ji hêla dengsaziyê lêkolînek kir. Bi vê armancê serê pêşîn me ji navenda Çaldiranê ji tax û mirovên cuda deng tomar kir ku piştî deşîfrasyonê ev tomar nêzî pêncî rûpelî çêbû. Dûre me di van metnan de dengên ji kurmanciya nivîskî cuda, yek bi yek tespît kirin û her wiha dengên ku di kurmanciya nivîskî de ji bo wan nişane tunene, diyar kirin û bi sîstema transkrîbsiyonê ya navneteweyî jî nişan dan.

Di vê çarçoveyê de me ev metn ji hêla veguherîn, ketin, kewyan, lêzêdebûn, dubarebûn û pevguherîna dengan analîz kirin û bi kurmanciya nivîskî re jî berawird kirin. Di encamê de me gelek taybetiyên dengsaziyê yên devoka Çaldiranê û cudahiya wê ji kurmanciya nivîskî diyar kir. Li gel vê yekê me ji van metnan, hin gotinên ku nayên fêmkirin û bêjeyên xweserî devoka Çaldiranê ne ferhengokek pêk anî û ev ferhengok jî di dawiya xebatê de da.

Peyvên Sereke: Kurmancî, Devok, Navçeya Çaldiranê, Dengzanî, Dengsazî

ÖZET

Bu çalışmada Çaldıran ağzını fonetik açıdan inceledik. Bu amaçla öncelikle farklı mahallelerden farklı kişilerle görüştük ve bu görüşmeler sonucunda da yaklaşık olarak elli sayfaya yakın metin elde ettik. Sonra bu metinler üzerinde çalışarak yazılı/ standart Kürtçede olmayan veya olduğu halde alfabede gösterilmeyen harfleri tespit ettik ve bunların uluslararası fonetik alfabedeki karşılıklarını verdik.

Ayrıca amacımız doğrultusunda metinlerdeki seslerin dönüşümü, düşüşü, kaynaşması, türemesi, tekrarlanması ve göçüşmesini analiz ettik ve yazılı/standart Kürtçeye karşılaştırdık.

Sonuç bölümünde ise Çaldıran ağzının fonetik farklılıklarını tek tek yazmaya çalıştık. Bununla birlikte çalışmamızın sonunda bu metinlerde anlaşılması zor olan söz öbekleri ve Çaldıran ağzına has kelimelerin anlamlarını kapsayan bir sözlük sunduk.

Anahtar Kelimeler: Kurmanci, Ağız, Çaldıran İlçesi, Sesbilim, Ses Bilgisi

SUMMARY

In this study we have searched sub-dialect of Çaldıran in terms of phonology. Accordingly we have recorded voice of people from different neighbourhoods of Çaldıran and these recordings took nearly fifty pages after dechiphering. Then we have detected sounds those differs from written Kurmanji and those which are not represented by any letters in written Kurmanji and we show them via International Phonology Alphabet (IPA). In this framework we have analyzed these texts in term of phonetic change, voice omission, vocalic alternation, alliteration, and phonetic exchange. Later we have compared them with written Kurmanji.

At the end we have determine many phonetic characteristics of sub-dialect of Çaldıran and many differentness of it from the written Kurmanji. Along with that, we have prepared a dictionary from some incomprehensible phrases and words of sub-dialect of Çaldıran and presented it at the end of the study.

Key Words: Kurmancî, Sub-dialect, town of Çaldıran, Phonology, Phonetic

LÎSTEYA TABLOYAN

Tablo 1	Tabloya Anatomiya Dengsaziyê
Tablo 2	Tabloya Teşegirtina Dengdêrên Kurmancî
Tablo 3	Tabloya Dengdêrên Kurmancî
Tablo 4	Tabloya Dengdarên Kurmancî
Tablo 5	Tabloya Dengdêrên Çaldiranê
Tablo 6	Tabloya Dengdarên Çaldiranê



KURTEBÊJE

b.	: baneşan
b.n	: berhema navborî
bnr.	: binêrin
c	: cild
cn.	: cînav
d.	: daçek
êd.	: ên din
g.	: gihanek
l	: lêker
h.	: hoker
h.b.	: heman berhem
hn.	: hevalnav
j.	: jimar
n.	: nav
r.	: rûpel
wd.	: wekî din
wer.	: werger
c.x	: cînavkên xwerû

NÎŞANEYÊN VEGUHESTINÊ

1. Dengdêr

a	: a
˘a	: a'ya eynî
e	: e
˘e	: e'ya eynî
ê	: ê
i	: i
˘i	: i'ya eynî
î	: î
˘î	: î'ya eynî
o	: o
u	: u
˘u	: u' ya eynî
û	: û

2. Dengdar

b	: b
c	: c
ç	: ç
ç̇	: ç'ya nehilmî û nerm
d	: d
f	: f
g	: g
h	: h
ḣ	: h'ya qirikî û zimanokî ye.
j	: j
k	: k
k̇	: k'ya nehilmî û nerm
l	: l
m	: m
n	: n
p	: p
ṗ	: p'ya nehilmî û nerm

q	: q
r	: r
ř	: ř'ya stûr
s	: s
ş	: ş
t	: t
ţ	: ţ'ya nehilmî û nerm
v	: v
w	: w
x	: x
ÿ	: ÿ'ya qirikî û zimanokî
y	: y
z	: z
...<	: forma devoka Çaldiranê
<...	: forma zimanê nivîskî/standart
(...)	: Di metnan de cihên ku nehatine fêmkirin.

NAVEROK

KURTE.....	I
ÖZET.....	II
SUMMARY.....	III
LÎSTEYA TABLOYAN.....	IV
KURTEBEJE.....	V
NÎŞANEYÊN VEGUHESTINÊ.....	VI
DESTPÊK.....	5
1. Mijar û Girîngiya vê Xebatê.....	5
2. Rêbaz û Çavkanî.....	6
3. Çaldiran.....	8
3.1. Erdnigariya Fîzîkî.....	8
3.2. Erdnigariya Beşerî.....	9
BEŞA YEKEM.....	10
1. ZIMAN Ê FONOLOJÎ.....	10
1.1. Ziman.....	10
1.a. Zarava.....	11
1.b. Devok.....	12
1.2. ZIMANÊ KURDÎ.....	12
2. DENGNASÎ (FONOLOJÎ).....	14
2.1. Dengsazî.....	15
2.2. BIRÊN DENGAN: DENG DÊR Ê DEGNDAR.....	15
2.2.a. Dengdêr.....	15
2.2.b. Dengdar.....	16
2.3. Dengnasiya (fonolojî) Kurmancî.....	17
2.3.1. Dengdêrên Kurmancî.....	17
2.3.2. Dengdarên Kurmancî.....	19
BEŞA DUYEM.....	22
DENGNASIYA DEVOKA ÇALDIRANÊ.....	22
1. Dengdêrên Devoka Çaldiranê.....	22
1.a. Dengdêra (°a).....	22
1.b. Dengdêra (°e).....	23
1.c. Dengdêra (°i).....	23

1.ç. Dengdêra (°i)	24
1.d. Dengdêra (°u).....	24
1.2. Veguherîna Dengdêran	25
1.2.a. Veguherîna "e" yê bo "i"yê:	25
1.2.b. Veguherîna "û" yê bo "î"yê:.....	25
1.2.c. Veguherîna "ê" yê bo "î"yê:.....	25
1.2.ç. Veguherîna "û" yê bo "i"yê:	26
1.2.d. Veguherîna "î" yê bo "ê"yê:	26
1.2.e. Veguherîna "e" yê bo "a" yê:	26
1.2.f. Veguherîna "u" yê bo "i" yê:.....	27
1.2.g. Veguherîna "û" yê bo "a"yê:	27
1.2.h. Veguherîna Dengdêr û Degdarên Cînavkên Kesane.....	29
1.3. Ketina Dengdêran.....	30
1.3.a. Ketina Dengdêra "i"yê:.....	30
1.3.b. Ketina Dengdêra "e"yê:	31
1.3.c. Ketina "î"yê:	32
1.3.ç. Ketina "a"yê:	32
1.3.d. Ketina "ê" yê:	32
1.3.e. Ketina Kîteyan.....	33
1.4. Lêzêdebûna Kîteyan	34
1.5. Tewanga Navdrên Nêr	34
2. Dengdarên Devoka Çaldiranê	35
2.1.a. Dengdara ç.....	35
2.1.b. Dengdara ħ	35
2.1.c. Dengdara k.....	36
2.1.ç. Dengdara p.....	37
2.1.d. Dengdara r.....	37
2.1.e. Dengdara t	38
2.1.f. Dengdara x	38
2.2. Veguherîna Dengdaran.....	40
2.2.a. Veguherîna "b" yê bo "v" yê:	40
2.2.b. Veguherîna "l"yê bo "r" yê:	40
2.2.c. Veguherîna "l" yê bo "t" yê:.....	40
2.2.ç. Vuguherîna "h" yê bo "w" yê:	40
2.2.d. Veguherîna "y" yê bo "k" yê:.....	40
2.2.e. Veguherîna "z"yê bo "j" yê:	41

2.2.f. Veguherîna "d" yê bo "t" yê:	41
2.2.g. Veguherîna "j" yê bo "c" yê:	41
2.2.ğ. Veguherîna "j" yê bo "ş" yê:	41
2.2.h. Veguherîna "s" yê bo "z" yê:.....	42
2.2.i. Veguherîna "s" yê bo "ş" yê:.....	42
2.2.î. Veguherîna "m" yê bo "n" yê:	42
2.3. Lêzêdebûna Dengdaran	42
2.3.a. Lêzêdebûna "y" yê:	43
2.3.b. Lêzêdebûna "k" yê:	43
2.4. Pevguherîn(metatez).....	43
2.5. Dubarebûna Dengdaran (Şedde)	43
2.6. Ketina Dengdaran	44
2.6.a. Ketina Dengdara "r" yê.....	44
2.6.b. Ketina Dengdara "l" yê	44
2.6.c. Ketina Dengdara "s" yê	45
2.6.ç. Ketina Dengdara "b" yê.....	45
2.6.d. Ketina Dengdara "d" yê	45
2.6.e. Ketina Dengdara "k" yê.....	45
2.6.f. Ketina Dengdara "w" yê	46
2.6.g. Ketina Dengdara "h" yê	46
2.6.ğ. Ketina Dengdara "n" yê	47
2.6.h. Ketina Dengdara "t" yê	49
2.7. Kewyana dengdaran.....	50
ENCAM.....	51
BEŞA SÊYEM	54
METNÊN NIMÛNE JI DEVOKA ÇALDIRANÊ	54
NÎŞANEYÊN VEGUHESTINÊ	54
1. Dengdêr.....	54
2. Dengdar	55
1 GIRARSIBE	56
2 ҺELÎSE	57
3 Z'EDÊ ZARA.....	57
4 NIVÎNGIRÊDAN	57
5 DESŤGIRŤIN	58
6 SERŤÊDAN	60
7 BERODAN.....	60

8 QEYNEK	61
9 KUMGUSIL	62
10 GENIM	62
11 D'EN	65
12 KOSEGELI	66
13 MELE HIRO	67
14 CÄNDIN	68
15 AŞ	69
17 TOPA GARANE	80
18 ÇUYINA ZOZANAN	80
19 ÇIROK DEWRÊŞ	80
PÊVEK	94
FERHENGOKA DEVOKA ÇALDIRANÊ	94
ÇAVKANÎ	106

DESTPÊK

1. Mijar û Girîngiya vê Xebatê

Mijara vê tezê Dengsaziya Devoka Çaldiranê ye. Armanca me ya vê xebatê ew e ku em dengên navçeya Çaldiranê yê ku di zimanê nivîskî de tunene, an hebin jî ji bo wan tu nîşane nehatibin danîn, tesbît bikin, taybetmendiyên wan diyar bikin û ji aliyê *veguherîn, ketin, kewyan, lêzêdebûn, dubarebûn û pevguherîna* dengan analîz bikin û bi kurmanciya nivîskî re jî berawird bikin.

Di hemû zimanan de zimanê nivîskî û zimanê devkî ji hev cuda ne. Gelek gotin û qalibên gotinê yên dewlemend yên ku di zimanê devkî de hene, di zimanê nivîskî de tunene. Ji ber vê yekê gelek caran mirov nikare dewlemendiya zimanê devkî derbasî zimanê nivîskî bike. Ev yek jî girîngiya xebatên devokê derdixe holê. Bi xebatên devokan mirov dikare van dewlemendiyan tesbît û mayinde bike.

Li deverên ku kurd lê dijîn, heya niha li ser fonolojiya zaravayê kurmancî xebateke xweser nehatiye kirin. Xebatên zimên yên heyî bêtir li ser rêzimana kurmancî bûye. Di van xebatên rêziman de jî fonolojî weke beşeke serbixwe nehatiye dayîn û zêde behsa fonolojiyê jî nehatiye kirin. Vê yekê xebata me diwartir kir. Lewra gava me li Çaldiranê xebata qadê kir em li rastî gelek deng û rûdanên dengî hatin.

Ev çend salên dawî ne ku di sazî û dezgehên fermî de li ser zimanê kurdî xebatên akademîk tên kirin. Ev xebat bêtir li ser edebiyat, folklor û çanda kurdî ne. Helbet ev xebat ji bo zimanê miletekî geş bibe, xebatên jênager in. Lê belê bi qasî van xebatan xebatên zimanzaniyê, bi taybetî zarava û devokên zimên jî girîng in. Di nav van xebatên akademîk ên ku me behs kirin, xebatên li ser devokên kurmancî pir

kêm in. Bi qasî ku me dît, ji bilî teza Zafer Açar a li ser *Devoka Devera Filistanê*¹, li ser devokên tu herêm û deveran, ne xebatên amatorane, ne yên akademîk û ne jî yên profesyonel hene.

Bi xebatên li ser devokan, gelek peyv, gotin, çîrok, helbest, metelok, serpêhatî û hwd. bi dest dikevin. Em dikarin bibêjin gelek peyvên ku heya niha di tu ferhengên de tunebin an jî çîrokên ku li tu deran nehatibine nivîsîn bi van xebatan dertên holê. Ji ber vê yekê xebatên bi vî rengî, bi kêrî xebatên li ser edebiyata gelêrî, nûjen û her wiha bi kêrî xebatên zimanzanan jî tî.

2. Rêbaz û Çavkanî

Ev xebat bi navenda navçeya Çaldiranê ve sînordar e. Em li navenda navçeyê geriyên û me bi pîrejin û pîremêran re hevdîtîna pêk anîn û nêzikî 50 rûpel nivîs ji dengê wan tomar kir.

Pêşiyê me pîrejin û pîremêrên ku temenê wan mezin û kurmanciya wan bi kêrî xebata me were diyar kirin. Piştî me dest bi xebata qeydkirinê kir me dît ku di nav kurmanciya axivêrên Çaldiranê de peyv û gotinên bi zimanê tirkî zêde ne. Ji ber vê yekê ji bo tomarkirina dengî em li pey wan kesan ketin ku kurmanciya wan zêde asîmîle nebûbe.

Beriya ku em biçin cem wan me hinek mijarên ku em ê ji wan bipirsin diyar kirin. Ev mijarên jî ev bûn: *Çêkirina xwarinan, lîstok, serpêhatî, çûyîna aşî, cot, bênder, çûyîna zozanan, deniyê diranan, zedê zarokan, dawet, destgirtin û hineya bûkê û hwd.* Dûre me ev pirs ji wan kesan kirin. Lê carinan jî pîrejin û pîremêr beriya ku em pirsan bi wan bikin diaxivîn û me jî axaftina wan nedibirî û dengê wan qeyd kir. Piştî vê pêvajoyê me deng bi baldarî guhdar kirin û ew jî derbasî ser rûpelan kirin. Paşê me li ser metnên ber destê xwe dest bi tespîtkirin û analîzkirina dangan kir. Ji bo dengên ku di zimanê nivîskî de tunebûn an hebin jî nîşaneyên wan tunebûn, me nîşane diyar kirin. Me ji bo her tîpên ku di alfabeyê de tunebûn, nîşaneyek diyar kir û di metnan de jî ev tîp diyar kirin.

Dûre me li gorî armanca xwe rûdanên van dangan diyar kirin. Ev rûdan veguherîn, ketin, kewyan, lêzêdebûn, dubarebûn û pevguherîna dangan e. Em di

¹ Zafer Açar, *Devoka Devera Filistanê*, Teza Lîsansa Bilind, Bîngol 2015.

metnan de lê rast hatin ku li gorî kurmanciya nivîskî gelek cudahî û taybetmendiyan dengên herêmê hene. Me hewl da ku em van taybetmendiyan dangan ji hêla xalên navborî, veguherîn, ketin, kewyan, lêzêdebûn, dubarebûn û pevguherîna dangan yek bi yek analîz bikin. Her wiha ji bo her ravekirin û analîzê, me jimareyek diyar kir.

Dengên ku me ji devê xelkê Çaldiranê girtin, bûn çavkaniya herî girîng a vê xebatê. Beriya ku em dest bi xebata xwe bikin me çavên xwe li ser tez û xebatên devokên kurmançî gerandin. Lê çawa ku me li jor jî got, ji bilî teza Zafer Açar a bi navê *Devoka Devera Filistanê* tu xebatên li ser devokên kurmançî, bi çavê me neketin. Me li hin xebatên ku li ser devokên tirkî hatine amadekirin nihêrîn. Di nav van xebatan de ya ku bêtir bi kêrî me hat û rê li ber me vekir, xebata ziman a Sadettîn Ozçelik û Erdogan Boz a bi navê *Bajarê Diyarbekirê Devoka Herêma Çûngûş û Çermûkê* bû. Her wiha me ji pirtûka Sadiq Bahaeddînê Amêdî ya bi navê *Rêzimana Kurdî Kurmanciya Jorî û Jêrî ya Hevberkirî*² û xebata Ebdulmecîd Reşîd Ehmed a bi navê *The Phonetic System of Modern Standart Kurdish*³, a li ser fonetîka soranî nivîsiye, îstifade kir.

Me ev xebat li ser sê beşan lê kir. Di beşa ewil de ji ber ku têkildarê mijarê ye em bi kurtahî li ser pênasîya ziman û fonolojî, zarava û devokê sekînin. Piştî van pênasîyan, me bi kurtahî behsa zimanê kurdî, zarava û devokên wê kir. Her wiha di vê beşa de em li ser dengnasî(fonolojî), dengsazî(fonetîk) û bi taybetî jî li ser dengzaniya kurmançî sekînin. Me dengên kurmançî û taybetmendiyan wan yek bi yek rave kirin û li ser tabloyan jî ev deng diyar kirin. Ji bo ku ev dengên navborî baş werin nasîn me her dengê bi sîstema transkrîbsiyonê ya navneteweyî jî nîşan da.

Di beşa duyem de jî me hewl da, em devoka Çaldiranê ji aliyê dengsaziyê ve analîz bikin. Ji bo ku em dengên di metnan de hene tespît bikin, me dengên qeydkirî du-sê caran guhdar kirin. Dûre me ji bo her dengê ku hatiye tespît kirin, nîşaneyek diyar kir. Me ev dengên ku di alfabeya nivîskî de tunene jî bi sîstema transkrîbsiyonê ya navneteweyî diyar kirin. Her wiha me dengên devoka Çaldiranê digel dengên

² Sadiq Bahaeddîn Amêdî, *Rêzimana Kurdî, Kurmanciya Jêrî û Jorî ya Hevberkirî*, weşanxana Dîwan, Stenbol 2102.

³ Abdulmecit Rashid Ahmad, *The Phonemic System of Modern Standart Kurdish*, The University of Michigan, 1986.

alfabeya nivîskî li ser tabloyê nîşan dan. Piştî ku me deng yek bi yek tespît û diyar kirin, me digel rûdanên dengan, bi berawirdkirina wan ya bi kurmanciya nivîskî re di vê beşê de dan. Me li aliyê rastê yê nîşaneyê "<..." forma kurmanciya devoka Çaldiranê û li aliyê çepê yê nîşaneyê "...>" jî forma kurmanciya nivîskî/standart nivîsî. Bi gotineke din me di vê beşê de li hember her gotin û peyvên devoka Çaldiranê şeweyê nivîsa gotin û peyvên kurmanciya nivîskî jî nivîsîn.

Beşa sêyem jî ji tekstan pêk tê û me ew nîşaneyên ji bo dengên ku di alfabeya nivîskî de tunene diyar kirine, danîn ser dengên devoka Çaldiranê. Yanê di vê beşê de dengên metnan giş bi nîşaneyên diyarkirî hatine nivîsandin. Di metnan de du cihên ku me gotinên axivêran fêhm nekirin hebûn û me ew jî bi nîşaneyê "(...)" diyar kirin.

Di encamê de jî me cudahî û taybetmendiyan deng û rûdanên dengên devoka Çaldiranê û yên zimanê nivîskî xal bi xal nivîsîn û bi mînakên jî ew rave kirin.

Di dawiya xebatê de jî me ferhengokeke ku ji peyvên deverê ne, amade kir û weke pêvek da. Di vê ferhengokê de gelek peyv xweserî devoka Çaldiranê ne. Dîsa gelek peyv li gorî zimanê nivîskî veguherîne û me ev peyv digel wateya wan a zimanê nivîskî dan.

Ji ber ku em behsa devoka Çaldiranê dikin, berî her tiştî divê em Çaldiranê bi awayekî giştî bidin nasîn. Em ê bi kurtasî behsa erdnîgarî û civaka Çaldiranê bikin. Lewra tesîra erdnîgarî û jiyana civakî li ser ziman gelek e. Her wiha me xwest em li ser dîroka Çaldiranê jî agahiyê bidin lê mixabin tu agahiyên nivîskî û devkî bi dest neketin.

3. Çaldiran

3.1. Erdnigariya Fîzîkî

Aqara Çaldiranê 1742 km² û pileya wê ji behrê 2050 mêtroye. Çaldiran li ser deşteke ava bûye. Ji aliyê rojhilatê ve bi Îran, rojhilatê bakûr bi Bazîd, bakûr bi Giyadîn, rojava bi Muradiye û başûr jî bi Qelqeyê re cîran e. Rêya E-99 di nava Çaldiranê re derbas dibe. Ava Çemê Benda Mahê ji nav erdê navçeyê dizê û ber bi Gola Wanê diherike.

Çiyayên sereke yên Çaldiranê ev in: Li bakûr Tendûreka Mezin, Tendûreka Biçûk; li rojava Çiyayê Bêmiraz, Çiyayê Kose û Çiyayê Miladirij; li başûr Çiyayê

Pireşît û Çiyayê Kebîr; li rojhilat Çiyayê Eleganê, Çiyayê Aktaşê, Çiyayê Alîkelle, Çiyayê Boz û Çiyayê Kafê.

Hewayaya navçeyê havînan hênîk e û gelek caran hişkesalî heye. Zivistanan hewa pir sar e û berf zêde lê dibare.⁴

3.2. Erdnîgariya Beşerî

Çaldiran bi navê Bazîdaxa, Ebexe, Çardêran, Çildêran jî tê nasîn. Heya sala 1987'an bi navçeya Muradiyeyê ve girêdayî bû. Di sala 1987'an de Çaldiran bû navçe.

Li gorî îstatîstîkên dewletê yê sala 2012'an gelheya Çaldiranê 67.329 e û jê 14.361 li navenda navçeyê dijîn.

Niştcehên Çaldiranê debara xwe bi ajaldarî, çandinî û bazirganiyê dikin.

Di sala 1976'an de li Çaldiranê erdhejê mezî çêbûye û di vê erdhejê de nêzikî 5 hezar şênîyên Çaldiranê jiyana xwe ji dest dane. Vê erdhejê jiyana niştcehên navçeyê ji aliyê civakî ve guhertiye.

Gelê Çaldiranê hemû misilman in û em dikarin bibêjin hemû li ser rêça Mezheba Şafiî ne. Ji bilî karmendên dewletê yê ku ji derve hatine, hemû niştcehên Çaldiranê kurd in.

Ji aliyê jiyana civakî ve Çaldiran navçeyêke mûhafazakar e û em dikarin bibêjin rola jinê ya civakî di nava jiyana aboriyê de pir kêr e.

Li gorî îstatîstîkên dewletê yê sala 2012'an ji % 89 niştcehên Çaldiranê xwende ne. Hejmara kesên nexwende 6818 ye û ji van 5247 jin; 1571 jî mên in.⁵

⁴ http://www.caldiran.gov.tr/default_B0.aspx?content=1008

⁵ http://www.caldiran.gov.tr/default_B0.aspx?content=1008

BEŞA YEKEM

1. ZIMAN Û FONOLOJÎ

1.1. Ziman

Ziman amûra ragihandinê ya herî pêşketî ye ku mirov pê hest û ramanên xwe radigihînin hevûdu. Mirov bi alîkariya zimanî ne tenê hevûdu têdigihîjin, her wiha mîrateyên jiyânê yên ku bi hezar salan derketine holê jî radigihînin hevûdu. Bi gotineke din ziman dibe pira navbera nîfşên nû yên kevn. Raman û hest bi riya zimanî der dibin û her wiha ziman raman û hestên me şênber dike.

Zimanzanan der barê pênaseya zimên de gelek gotinên curbecur kirine. Em ê li vir, ji van nêrînan çend heban bidin.

Li gorî Kaken Ahanov: Ziman, amûra danûstandina fikir û hevûdu têgihîştinê ye.⁶

Tewfîq Wehbî zimanî wiha pênase dike: Ziman nîşana bîrên me ye. Ziman tiştêkî tete gotin û nivîsîn jî.⁷

Reşîdê Kurd zimanî wiha terîf dike: Ziman, li ser hin awa û rêzanan ava ye. Rêya van rêzanan bi pêş me dikeve, lewra jê re rêzan, peyiv û nivîsandina durist jî tê gotin.⁸

⁶ Kaken Ahanov, *Dil Biliminin Esaslari*, Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara 2008, s. 13.

⁷ Tewfîq Wehbî, *Destûrî Zimanî Kurdî Cizî Yekem*, Bexda Daruttebaet el-Hedîse 1929 lapere (1).

⁸ Reşîdê Kurd, *Rêzimana Zimanê Kurmancî*, Çapxana Kerem 1956.

Zimanzanê tirk Dogan Aksan jî der barê zimanî de wiha difikire: Ziman, navgîna diyarkirina hest, raman û daxwazan e ku wateyan bi rêya dengan di nav sistemeke xweser a dengan de nîşan dide.⁹

Ziman, amûra vegotinê ya herî girîng e ku em pê hest û ramanên xwe der tînin.¹⁰

Ziman ew amûra ragihandinê ye ku ji kombûna rêzepeyvên mantiqî pêk hatiye.¹¹

Ziman amûreke taybet e ku ji bo mekan, mirov, heyber, bûyer, hest û ramanan teswîr bike, saz bûye.¹²

Ziman rêzeyeke piralî ye ku ji hêmanên hevpar ên wekî deng û wateyê pêk tê û her wiha di civakê de ragihandina navbera mirovan pêk tîne.¹³

Ziman ew pergala nîşaneyan e ku ji dengên xweser ên civaka mirovan pêk tê.¹⁴

Ji van gotinên zimanzanan ên der barê ziman mirov girîngiya ziman a ji bo jiyan û berdeamkirina jiyanê hîn dibe. Cihê ku ziman lê nebe mirov nikarin karekî kolektîf bikin. Ji bo jiyanê hevpar, karbeşî û berdeamiya civakê pêdivî bi zimên heye. Civak tenê bi alîkariya zimên dikare bi pêş keve.

Mirov nikare bibêje ku zimanek ji yên din dewlemendtir, feqîrtir an go baştir û xerabtir e. Her zimanek li gorî pêdiviyên civaka ku lê tê axaftin bi pêş dikeve.

1.a. Zarava

Zarava, şêweyekî cihêreng yê zimanekî ye ku ji hêla axêverên wî zimanî ve li welat û herêmên cuda tê axaftin.¹⁵

Zarava, binbeşên zimanekî ne ku bi belgeyên nivîskî yên curbecur tên raçavkirin; cudahiya curbecur yê deng, şêwe, wate û rêzkerinê nîşan didin.¹⁶

⁹ Doğan Aksan, *Her Yönüyle Dil Ana Çizgileriyle Dil*, Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara 2009, c. 1, s. 50.

¹⁰ Gülden, Sağol Yüksekaya, *Türk Dili Kitabı*, Kesit Yayınları, İstanbul, 2012, s.13.

¹¹ Şerif Aktaş, Osman Gündüz, *Yazılı ve Sözlü Anlatım*, Akçağ Yayınları, 2013, s. 28.

¹² Michael C. Corballis, *İşaretten Konuşmaya Dilin Kökeni ve Gelişimi*, Aybek Görey (Çev.), Kitap Yayınevi, İstanbul 2003, s.12.

¹³ Atilla Özkırımlı, *Türk Dili Dil Ve Anlatım*, İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları, 4. Baskı, İstanbul 2007, s. 17.

¹⁴ Mehmet Aydın, *Dilbilim El Kitabı*, 3F Yayınevi, İstanbul 2007, s. 14.

¹⁵ Doğan Aksan, a.g.e. , s. 141.

¹⁶ Nesrin Bayraktar, *Dil Bilimi*, Nobel Yayın Dağıtım, 2. Baskı Ağustos, Ankara 2006, s. 46.

Zarava, ew şêweya cudahiyê ya ji aliyê gotin, vegotin, rêzgotina zimanekî ye ku li dewlet û herêmên cuda tê axaftin.¹⁷

Kurdî dabeşî gelek zaravayan dibe. Mirov dikare soranî û kurmançî ji bo zaravayî weke mînak bide.

1.b. Devok

Devok, şaxên zimanekî ne ku danakevin bin rêjeya %70 a hevtêgihiştinê - tê qebûlkirin ku zimanek di vê rêjeyê de têgihiştinê pêk tîne- lê belê ji hêla gotin, wate û bikaranînê ve hin cudahiyan nîşan didin.¹⁸

Şêweya axaftinê ye ku di nav heman zaravayî de xweserî herêmên niştecibûnê yên biçûktir in û xwe dispêrin cudahiyên biçûktir.¹⁹

Devok, di dewletekê de, li gor zaravayê standart, cudahiyên gotinê yên di nav zimanê axaftinê yên bajar û herêman e.²⁰

Di kurmançî de gelek devok hene. Mirov dikare devoka Behdînan, Mereş, Bazîd û Serhedê ji bo devokê li vir weke mînak bide.

1.2. ZIMANÊ KURDÎ

Zimanê kurdî ji koma herî mezin a zimanan ango ji koma Hînd-Ewrûpî ye. Her wiha kurdî, di nav vê komê de ji malbata zimanên îranî ye.²¹

Zimanên Îranî bi du awayan tên dabeşkirin; li gorî serdeman wekî serdema kevnar, serdema navîn û serdema nû. Li gorî erdnîgariyê; wekî zimanên bakurê Îranê, zimanên başûrê Îranê, zimanên rojhilatê Îranê û zimanên rojavayê Îranê. Zimanên rojavayê Îranê jî bi ser du koman ve tên dabeşkirin: Zimanên başûrê rojava û zimanên bakurê rojava. Kurdî di nav zimanên bakurê rojava de ye.²²

Zimanê kurdî di nav xwe de vediqete li ser gelek zarava û devokan. Cara ewil yê ku dabeşkirina zaravayan kiriye Şerefxan Bedlîsî ye. *Şerefxanê Bedlîsî* di Şerefnameyê de wiha dibêje: Civat û hozên kurd bi ziman, tore û rewşa xwe ya

¹⁷ Atilla Özkırımlı, *a.g.e.*, s. 34

¹⁸ Nesrin Bayraktar, *a.g.e.*, s. 47.

¹⁹ Doğan, Aksan, *a.g.e.*, s.142.

²⁰ Atilla Özkırımlı, *a.g.e.*, s. 34.

²¹ Sami Tan, *Waneyên Rêzimanê Kurmançî*, Weşanên Welat, Stenbol 2000, r.10.

²² Sam Tan, *Rêzimana Kurmançî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî, Stenbol 2011, r. 23

civakî dibin çar bir:²³ **bira yekem:** kurmanc, **bira duyem:** lor, **bira sêyem:** kelhûr, **bira çarem:** goran.

Li gorî Cemal Nebez jî zarava û devokên kurdî wiha ne:²⁴

1. Kurmanciya Jorîn: botanî, hekarî, badînanî, aşteyî, hekarî.

2. Kurmanciya Naverast: soranî, silêmanî, sineyî, erdelanî, germiyanî, hewlêrî, kerkûkî, mukrî, şarbajêrî, pişdêrî

3. Kurmanciya Jêrîn: feylî, kirmanşahî, lekî, kelhorî, xaneqînî, lorî

4. Goranî û Zazakî: goranî, hewramî, zazakî (kirdkî, kirmanckî, dimilkî)

Di nav zaravayên kurdî de yê herî zêde tê axaftin kurmacî ye. Qismekî mezin ji kurdên Tirkiyeyê, tevahiya kurdên Sûriye, Xorasana Îran û Yekitiya Sovyetistana berê bi zaravayê kurmacî diaxivin.²⁵

Ev lehçe (kurmacî) ji alî nufûsa Kurd a Lubnanê, Ermenîstanê, Gurcîstanê, Azerbaycanê, Qazaxistanê, cumhuriyetên Asya Navîn yên din û ji alî Kurdên Xorasanê û Konyayê û hin Kurdên Ankarayê jî tê axaftin.²⁶

Çima ku tenê di demên borî û lêkerên gerguhêz de lêker li gorî bireserê tê kişandin, zaravayê kurmacî zaravayekî nîv-ergatîv e. Di dema niha û bê de kurmacî her tim li gorî kirdeyê tê kişandin.

Her wiha zaravayê kurmacî zaravayekî tewangbar e. Cureyên guherbar ên peyvan ditewin û bi vê tewandinê re jî dirûvê wan digihure. Ev pey carinan bi qertafekê ditewin, carinan jî di nav xwe de bi guhertinekê ditewin.

Di kurmacî de bi alîkariya tewangê zayend û mêjera navdêran jî diyar dibe. Ji ber vê yekê ne tenê navdêrên giyanewer, yên negiyanewer jî di kurmacî de xwedî zayendekê ne. Bi gotineke di kurmacî de him zayenda biyolojîk û him jî zayenda mecazî ango zayenda rêzimanî heye.

²³ Şerefyan Bidlîsî, *Şerefname, Dîroka Kurdistanê, Weşanên Avesta*, Stenbol 2007, r. 101.

²⁴ Kadri Yıldırım, *Temel Alıştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilbilgisi Kurmacî Lehçesi*, Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları, İstanbul 2012, 2. baskı, s. 25.

²⁵ Mehrdad R. Izady, *Bir El Kitabı Kürtler*, Doz Yayınları, İstanbul 2004, s. 305.

²⁶ Mûrad Ciwan, *Kürtçe Açıklamalı Kürtçe Dilbilgisi*, Jîna Nû Yayınları, Diyarbakır 2014, s.45.

Ji aliyê darijtina peyvan ve jî kurmançî bi pêşgir, navgir û paşgiran didarije. Ev pêşgir, paşgir û navgir tên pêş, nav û paşiya peyvê û peyveke nû çêdikin.

Her zaraveyekî kurdî xwediyê xweseriyekê ye. Wek mînak soranî ne zaraveyekî tewangbar e û di soranî de zayenda rêzimanî nîn e. Di zaravayê dimilî de jî zayend ji kurmançî bêtir e. Di warê cînavk û kişandina lêkeran de kurmançiya jêrîn û kurmançiya jorîn nêzî hev in. Zaravayên bakûr jî di warê zayend, tewangbarî û ergativiyê de nêzî hev in.

Ji aliyê peyvan û denganiyê ve zaravayên ku nêz û dûrî hev hene. Ji aliyê peyvan kurmançî û kurmançiya jorîn nêzî hev in. Zaravayê goranî û kurmançî têkildarî hev in û zaravayên herî kevnare dixuyên.²⁷

2. DENGNASÎ (FONOLOJÎ)

Xebatên li ser dengnasiyê (fonolojî) di sedsala XX'an de dest pê kiriye, geş bûye û dengnasiyê jî wek zanistêke serbixwe di nav zanistên din de cihê xwe girtiye. Cara ewil Saussure peyva fonolojiyê bi kar aniye. Saussure xwe spartiyê wê ramanê ku li gor wê 'di lêkolîna zimên de her fonemek xwediyê peywirekê ye' û dengên zimên ji hêla van peywiran vekolaye û terma fonolojiyê di vê wateyê de bi kar aniye.

Der barê pênaseya fonolojiyê de gelek nêrînên cuda hene. Em ê li vir çend nêrînan bidin. Li gorî Qanatê Kurdo: "Fonolojî, fêrbûn û peydabûna dengêkan e."²⁸ Ebdûrehman Merûf fonolojiyê wiha rave dike: "Beşêke le zanistî ziman û der barey dengêkanî axawtinî mirov dediwe û le sîstem û yasan dekolêtewe."²⁹ Muhemmed Emîn Hewremanî jî fonolojiyê wiha rave dike: "Fonolojî, ew zanistê ye ke lew dengane dekolêtewe ke le demî (zar) mirovewe û berêkûpêkî derdiçin, we wûşey watedarî zimaniyan lêwe peyda debê."³⁰

Dengnasî, dengên zimanên dinyayê bi tevahî dike mijara xwe, di hemû zimanan de xalên hevpar, rûdan û qanûnan lêdikole.³¹ Heke dengnasî zimanekî tenê ji aliyê dengên wê ve analîz bike weke dengsazî tê binavkirin.

²⁷ Sami Tan, h.b. r. 29.

²⁸ Qanatê Kurdo, *Gramatîka Zimanê Kurdî*, Yêrevan, 1960

²⁹ Ebdûrehman Hacî Merûf, *Zimanê Kurdî li Ber Roşnayî Fonetîk da*, r. 3.

³⁰ M. Emîn Hewremanî, *Fonetîkî Zimanê Kurdî*, Bexda 1973, r. 14.

³¹ Doğan Aksan, a.g.e. , s. 50.

Fonolojî, teswîra wan pergal û modelên dengan e, yên ku di zimanî de pêk tên. Xebata li ser zimanekî da ku dengên wî yên cuda bên derxistin, anku ew dengên ku li ser wateyê bandordar in, dikeve çarçoveya fonolojiyê.³²

Ji wê zanista ku li ser çêbûn, guherîn, lêkolîn û şopandina dengan dixebite re dengzanî tê gotin.³³

Dengnasî di nav xwe de dabeşî gelek şaxan dibe: Dengnasiya Giştî, Dengnasiya Bihîstinî, Dengnasiya Gotinî, Dengnasiya Fیزیolojîk, Dengnasiya Azmûnî û Dengnasiya Akûstîk.³⁴

2.1. Dengsazî

Di zanista zimanzaniyê de, ji zanista lêkolîna pêkhatin, pevguhaştin, ravekirin û pêşkêşkirina dengên axaftinê re dengesazî tê gotin.³⁵ Bayê ku ji pişika mirov derdikeve, diçe zengilorê, li vir bizavekê dide ta an jî jiyên deng; ew deng bi alîkariya qirik, lêv, diran, ziman, arîka devî û difîna mirov dirûvê digire.³⁶

2.2. BIRÊN DENGAN: DENG DÊR Û DEGNDAR

2.2.a. Dengdêr

Dengên ku rasterat ji devê mirov derdikevin û li cihekî naliqin dengdêr in. Dema têlên dengan digihîjin hev hewayê di kezebê de li ser hev nav wan re derbas dibe û wan ji hev vediqetîne û ji ber vê ev dilerizin. Dengên ku bi vî awayî çêdibin weke dengdêr tên pênasekirin.³⁷

Dengdêr, li gorî tevgera zimanî û li gorî cihê zimanî yê ku deng jê derdikeve ji hev cuda dibin. Hin dengdêr ji nêveka zimanî, hin ji pêşiya ziman hin jî ji dawiya zimanî derdikevin. Di hin dengdêran de serê zimanî ber bi jêr ve diçe, nêveka zimanî bilind dibe. Di hin dengan de ziman razayî disekine û di hinan de jî ziman ber bi jor ve radibe.³⁸

³² Peter Ladefoged, Keith Johnson, *A Course in Phonetics*, Wadsworth Cengage Learning, Boston, USA 2011, s.33.

³³ Nezîr Ocek, *Waneyên Rêzimana Kurmancî*, Weşanên Sîtav, İstanbul 2014, r. 21.

³⁴ Doğan Aksan, a.g.e. , c. II, s. 9-11.

³⁵ Samî Tan, *h.b.* , r. 36.

³⁶ Samî Tan, *h.b.* , r. 36.

³⁷ George Yule, *The Study of Language An Introduction*, Cambridge University Press 1985, r. 34.


³⁸ Samî Tan, *h.b.*, r.38.

2. 2. b. Dengdar

Dengên dengdar, li gor dengdêran girtîtir û kêmtir bi alan in. Dema têlên dengan ji hev vediqetin hewayê di kezebê de rasterast derdikeve. Dengên bi vî awayî derdikevin dengên dengdar (konsonant) in.³⁹

Dengên dengdar, li gor cîderka dengan, şêweyê derketina dengan û asta derketinê ji hev û din vediqetin:⁴⁰

Ji bo cîderk û derktin û şêwegirtina dengan baştir bê fêmkirin me şemayeke anatomiya dengsaziyê jî li jêr da. Bi alîkariya vê şemayê em dikarin bibînin ku, bayê piştî ku ji pişika mirov derdikeve, ji kîjan pêvajoyê re derbas dibe.



Şekil 1 - Tabloya Anatomiya Dengsaziyê⁴¹

³⁹ George Yule, a.g.e. , s. 34.

⁴⁰ Samî Tan, h.b. , r. 38.

⁴¹ Behrooz Shojai, *Notên waneya rêzimana kurmancî 1. Dengsazî*, Enstîtuya Zimanên Zindî Unîversîteya Mardîn Artuklu, r. 3.

2.3. Dengnasiya (fonolojî) Kurmancî

Çima ku di alfabeya kurmancî de ji bo her dengê tîpek nehatiye danîn, alfabeya kurmancî ne alfabeyeke fonetîk e. Gelek deng û taybetmendiyên wan hene ku di sîstema nivîsê de nayên diyarkirin.

Di zimanekî de ne mumkun e ku mirov ji bo her dengê tîpekê deyne alfabeyê. Ji ber vê yekê li gorî zarava û devokên zimanê kurdî dengên alfabeyê dibê kêm bin an jî hemû deng tê de diyar nebin.

Di alfabeya kurmancî de 31 yek tîp hene. Lê çawa ku me li jor jî got hemû deng di alfabeyê de cih nagirin. Ew dengên ku di nav axaftina gel de hene lê di alfabeyê de nehatine nîşankirin ev in:

1. "p"(par-sala çûyî),
2. "t"(tu- cînavka kesê duyemîn a yekjimar),
3. "ç" (çil-ê ku xwarinê zêde dixwe),
4. "k" (ka-xwarina ajalan),
5. Dengdara "r" ya lertzok (rê),
6. Dengdara qirikî x (axa),
7. Dengdara qirikî h (heyşt),
8. Dengdêrên "eynî", "a (alim), "î (miîn), "i (işk), "u (urf) , "o (orinî), e (esir)".


Pişti van agahiyan niha em ê yek bi yek li ser dengdêr û dengdarên ku di alfabeya kurmancî -zimanê nivîskî- de hene bisekinin.

2.3.1. Dengdêrên Kurmancî

Çawa ku me li jor jî got, ew dengên ku rasterat ji devê mirov derdikevin û li cihekî naliqin dengdêr in. Em dikarin dengdêrên kurmancî li gorî sê taybetmendiyên dirkandinê karakterîze bikin:⁴²

- a) Xala dirkandinê (artikulyasyon)
- b) Berziya ezmanî
- c) Guroverkirina lêvan

⁴² Behrooz Shojai, *Notên waneya rêzimana kurmancî 1. Dengsazî*, Enstîtuya Zimanên Zindî Unîversîteya Mardîn Artuklu, r. 3.



Şekil 2 - Tabloya Teşegirtina Dengdêrên Kurmancî

- a:** wekî *bar*. [ɑ]
- e:** wekî *şer*. [ɛ]
- ê:** wekî *şêr*. (dirêj) [e]
- î:** wekî *bir*. [i]
- î:** wekî *şîr*. (dirêj) [i]
- o:** wekî *roj*. (dirêj) [o]
- u:** wekî *kur*. [u]
- û:** wekî *şûr*. (dirêj) [u:]

Em dikarin taybetmendiyan dengdêrên kurmancî wiha rave bikin:

Dengdêrên dirêj: a, û, ê, î, o

Dengdêrên kurt: e, u, i

Li gorî cîderkê dengdêr:

Pêşderkî: ê, î, e

Navderkî: i, u

Paşderkî: a, û, o

Li gorî awayê vebûna devê mirov:

Gilover: û, o, u

Nîvgirtî: i, î, ê

Vekirî: e, a

Niha jê em li ser tabloya dengdêran diyar bikin:

LI GORÎ AWAYÊ VEBÛN Û CÎDERKÊ DENG DÊRÊN KURMANCÎ							
Li Gorî Vebûna Devî		Dengdêrên Pêşderkî		Dengdêrên Navderkî		Dengdêrên Paşderkî	
Li		Nîvgirtî	Vekirî	Nîvgirtî	Vekirî	Nîvgirtî	Vekirî
Gorî	Gilover			u		û,o	
Şiklê	Rast	î, ê	e	i			a
Lêvan							

Şekil 3 - Tabloya Dengdêrên Kurmancî

2. 3. 2. Dengdarên Kurmancî

Dengên dengdar, li gor dengdêran girtîtir û kêmtir bi alan in. Dengdar bi alikariya dengdêran der dibin û bêyî dengdêran bilêvkirina wan dijwar e.

- b** wekî *bav*, [b]
- c** wekî *car*, [dʒ]
- ç** wekî *çar*, [tʃ^h]
- d** wekî *dar*, [d]
- f** wekî *firavîn*, [f]
- g** wekî *gore*, [g]
- h** wekî *hêk*, [h]
- j** wekî *jîjo*, [ʒ].
- k** wekî *kerguh*, [k^h]
- l** wekî *laş*, [l̥]
- m** wekî *mal*, [m]
- n** wekî *nan*, [n]
- p** wekî *pak*, [p^h]
- q** wekî, *qelem*, [q]
- r** wekî *reş*, [r]
- s** wekî *ser*, [s]
- ş** wekî *şîv*, [ʃ]

t	wekî <i>tixûb</i> , [t ^h]
v	wekî <i>vala</i> , [v]
w	wekî <i>war</i> , [w]
x	wekî <i>xox</i> , [x]
y	wekî <i>yar</i> , [j]
z	wekî <i>ziman</i> , [z]

Di kurmanciya nivîskî de bîst û sê dengên dengdar hene. Em dikarin van dengdarên navborî li gorî cîderk û şeweyê derketinê wiha nîşan bidin.

Li gorî Cîderkê Derketina Dengdarên Kurmancî

- a) Dengdarên lêvkî: p, b, m, w
- b) Dengdarên diranlêvkî: f, v
- c) Dengdarên arîkî û qirikî: g, k
- d) Dengdarên pêşarîkî: ş, j, c, ç, r, l, y
- e) Dengdarên qirikî: q, x, h
- f) Dengdarên diranî: s, z, d, t, n

Li gorî Şeweyê Derketinê Dengdarên Kurmancî

- b** : cotlêvkî, girtiya nerm
- c** : pêşderkî, girtiya nerm
- ç** : hilmî, girtiya hişk
- d** : girtiya nerm
- f** : fizeka hişk
- g** : girtiya nerm
- h** : paşderkî, nîvdengdêr
- j** : fizeka nerm
- k** : hilmî, girtiya hişk
- l** : rexkî
- m** : cotlêvkî, difinî
- n** : pêşderkî, difinî

- p** : hilmî, girtiya hişk
q : girtiya hişk
r : lertzokî
s : pêşderk, fizeka hişk
ş : fizeka hişk
t : hilmî, girtiya hişk
v : fizeka nerm
w : nîvdengdêr
x : domdara hişk
y : pêşderkî, nîvdengdêr
z : fizeka nerm

Niha jî em li ser tabloya dengdêran diyar bikin:

		LI GORÎ CÎDERKÊ DENG DAR					
		Lêvk î	Diranlêv kî	Diran î	Pêşarî kî	Arikî,Qiri kî	Qirik î
LI GORÎ ŞÊWEYÊ DERKETINÊ DENG DAR	Fîzeka hişk		f	s	ş		
	Fîzeka Nerm		v	z	j		q
	Lertzokî				r		
	Girtiya Nerm	b		d	c	g	
	Girtiya Hişk	p		t	ç	k	
	Rexkî				l		
	Difinî	m		n			
	Domdara Hişk						x
	Nîvdengdê r	w			y		h

Şekil 4 - Tabloya Dengdarên Kurmancî

BEŞA DUYEM

DENGNASIYA DEVOKA ÇALDIRANÊ

1. Dengdêrên Devoka Çaldiranê

Me di vê xebata xwe de dengên ku di devoka Çaldiranê de hene lê belê di alfabeya nivîskî de tunene tespît kirin û ew bi taybetiyên wan diyar kirin. Di devoka Çaldiranê de ji bilî heşt dengdêrên (a, ê, e, î, i, u, û, o) ku di alfabeyê de hene, dengên dengdêrên ên wekî "ªa, ªe, ªi, ªî, ªu" jî hene.

a	wekî <i>bar</i> , [a]
e	wekî <i>şer</i> . [ɛ]
ê	wekî <i>şêr</i> , (dirêj) [e]
i	wekî <i>bir</i> . [ɪ]
î	wekî <i>şîr</i> . (dirêj) [i]
o	wekî <i>roj</i> . (dirêj) [o]
u	wekî <i>kur</i> . [u]
û	wekî <i>şûr</i> . (dirêj) [u:]
ªa	wekî <i>ªalim</i> , [ʃ]
ªe	wekî <i>ªen</i> [ʃ]
ªi	wekî <i>ªilm</i> , [ʃ]
ªî	wekî <i>ªîyar</i> , [ʃ]
ªu	wekî <i>ªurf</i> , [ʃ]

Niha jî em ê yek bi yek behsa taybetiyên dengdêrên ku di alfabeya nivîskî de ji bo wan nîşane nehatine danîn bikin.

1.a. Dengdêra (ªa)

Ev deng, dengekî qirikî ye û di zaravayê kurmancî de nîn e, lê belê bi piranî ji bêjeyên erebî derbasî kurmancî bûye. Dengê "a"ya eynî ye. Piştî lêkolînê me di van peyvan de ev deng tespît kirin:

(16.102) hev °aciz dikin, (16.94) °acizîya wî zêde bîye, (19.96) derkeçe °asîmanê heftanê

1.b. Dengdêra (°e)

Ev deng jî dengêkî qirikî ye û bêtir di serê bêjeyan de tê dîtin. Dengdêra "°e" jî weke dengdêra "°a"yê zêdetir jî peyvên erebî derbasî kurmancî bûne. Her wiha peyvên kurmancî û biyanî yên ku dengdarên wan ketine(halîkopter/°elîqopter) jî veguhezîne vî dengî. Piştî lêkolînê me di van peyvan de ev deng tespît kirin: (1.25) d°enê xwe, em (1.26) z°ef bûn, (1.29) t°erikî, (3.1) Z°edê zara, (3.8) b°elgî girê dida, (4.33) °erebê ga hebûn, nan (4.34) dip°et, (4.35) °eyne kolîka, ret dibû, (5.50) °eyb e, (10.36) z°ef bûya, direşandine (10.37) °erdê, ,(10.38) d°enav e, (10.39) d°en digirt, (10.40) °eynî mîta teka, 10.42) hinekî r°en çedikirin, (10.45) ser dip°etin, digotin d°enî, (11.45) ç°el dikirin, (12.7) se ç°evên wî, (13.9) mala °Emê, (13.10) °Emerîkê, (15.4)çar si°eta, (16.87) b°es kiriye, (16.88) de°watek bikira, (16.89) pêşiya °ewilî, (16.90) °elîqopter, dibin (16.91) °El°ezîzê, (16.92) °efû dikê, (16.93) °emrê wî, (16.96) °Evdalê Beko, (16.99) °eşîreke din bîye, (16.100) mi°elim, (16.101) navê wî M°emûd e, °erse dane wan, (16.103) devê b°erê, (16.104) em d°ewe vekin, (16.105) menfi°eta wana, (19.1) °Eloyê Memed Paşa, (19.80) °esrê zivirî, (19.82) çû °Erebistanê, 19.81) di °eşîrê da, (19.83) şeveqa °ewil, (19.84) girminiya n°elê hespekî, (19.18)şalpeke °Entabê, (19.85) qaweke t°ehl, (19.87) Cim°eta Mendol Axa, (19.88) têreke t°erikî, (19.89) d°ewa Xezalê kiriye, (19.90) bira w°ed be, (19.91) rabû °elermê, (19.92) °emrê bavê xwe, (19.93)°elê kim selam, (19.94) te d°ewata, (19.95)dezmêja °eşayê, (19.97) °eba xwe, (19.99)bi m°ede ye, (19.19)°edetê me.

1.c. Dengdêra (°i)

Dengdêra "°i" jî weke dengdêrên "°a" û "°a" yê qirikî ye lê belê jî wan dirêjtir tê xwendin. Ev deng him jî dengên erebî û him jî dengên kurdî yên ku dengdarên wan ketine derdikeve holê. Piştî xebata xwe me di van bêjeyan de ev deng tespît kirin: °i: (10.17) êdî °işk dibû, (19.98) bû °intiniya wî, (19.99)°inyad bikê, (19.100) °işaret kir.

1.ç. Dengdêra (°î)

Ev deng, dengê "°î"ya eynî û qirikî ye û bi piranî di serê peyvan de derdikeve pêşiya me. Ev dengdêr ne wekî dengdêrên din e û di bêjeyan de kêmtê dîtîn. Di devoka Çaldiranê de me di van peyvan de ev deng tespît kirin: (19.50)se pîştâ mi°înê, (19.101)°îyar dew vedixwe.

1.d. Dengdêra (°u)

Ev deng jî dengê qirikî ye. Di serê bêjeyan de tê dîtîn û bi piranî jî peyvên erebî derbasî kurmancî bûye. Dengdêra "°u" di devoka Çaldiranê de zêde nayê dîtîn. Min di xebata xwe ya li ser devoka Çaldiranê tenê peyvek dît: (19.19)ane gorî °urf °edetê me.

Piştî van agahiyan em dikarin ew dengdêrên ku di devoka Çaldiranê de hene, li ser tabloyekê diyar bikin.

LI GORÎ CÎDERKÊ DENG DÊR							
		Dengdêrên Pêşderkî		Dengdêrên Navdêrkî		Dengdêrên Paşderkî	
Li Gorî		Nîvgirtî	Vekirî	Nîvgirtî		Nîvgirtî	Vekirî
Vebûna	Rast	î, ê	e	i		°î, °i	a, °a, °e
Devî	Gilover			u		o, û, °u	

Şekil 5 - Tabloya Dengdêrên Çaldiranê

Piştî tespîtîkirin û diyarkirina taybetmendiyên dengdêrên devoka Çaldiranê, niha jî em ê ji aliyê veguherîn, ketin, kewyan, lêzêdebûn, dubarebûn û pevguherînê ve van dengdêran analîz bikin û bi kurmanciya nivîskî re jî berawird bikin. Em ê forma devoka Çaldiranê û li hember wê jî forma standart bidin.

1.2. Veguherîna Dengdêran

1.2.a. Veguherîna "e" yê bo "î"yê:

Di xebata li ser devoka Çaldiranê de me veguherîna "e" yê bo "î" yê zêdetir di jimareyên mîna sed û qatên wî û di hin bêjeyên din de dîtin:

(16.26) "du sid" < "du sed"

(5.42) "bûk hij wî mêrikî nekira" < bûk ji wî mêrikî hez nekira"

1.2.b. Veguherîna "û" yê bo "î"yê:

Di metnan de me dît ku veguherîna "û" yê bo "î" yê bêtir di demên borî de di lêkera "bûn"ê; pevdeng û hin peyvan de çêdibe:

(1.13) "se dixûnin" < "ser dixwînin"

(16.1) "bavê mi bîye" < "bavê min bûye"

(16.106) "hebîya" < "hebûya"

(5.37) "xûşkê bûkê" < "xwîşkên bûkê"

1.2.c. Veguherîna "ê" yê bo "î"yê:

Di metnan de me dît ku qertafa mê "-ê" ya tewangê gava ku tê dawiya veqetandeka nebinavkirî û yekjimar gelek caran dibe tewanga nêr "-î":

(5.6) "gustîlekî" < "gustîlekê"

(5.7) "desmalekî" < "desmalekê"

(10.1) "herêmekî" < herêmekê"

(10.11) "bihustekî" < "bihustekê"

(12.6) "malekî" < "malekê"

(15.2) "şevêkî" < "şevêkê"

(16.7) "rojekî" < "rojekê"

(16.12) "komekî" < "komekê"

(16.14) "salekî" < "salekê"

(16.32) "kaxizekî" < "kaxizekê"

- (19.15) "gîzmeķî" < "gîzmeķê"
 (16.75) "em kûrê dêķî ne" < "em kûrê dêyekê ne"
 (19.17) "xewneķî" < "xewneķê"
 (19.46) "maleķî" < "maleķê"
 (19.78) "derê çadireķî" < "derê çadireķê"
 (19.73) "bexşîşekî" < "bexşîşekê"
 (19.76) "caveķî" < "caveķê"

1.2.ç. Veguherîna "û" yê bo "î"yê:

Di metnan de me dît ku dengdêra "û"yê cihê xwe daye dengdêra "î"yê:

- (5.33) "berbi pêşva dihat" < "berbû pêşve dihat"
 (10.16) "zer nebibe" < "zer nebûbe"
 (13.7) "ew dişewûtîn" < ew dişewitin"
 (16.61) "hesen çibû Şerebxan" < "Hesen çûbû Şerebxan"

1.2.d. Veguherîna "î" yê bo "ê"yê:

Di metnan de me dît ku dengdêra "î"yê cihê xwe daye dengdêra "ê"yê:

- (5.39) "gevez davîtin" < "gevez diavêtin"
 (10.7.) "nîzká çîldayîne" < "nêzîka çîldayîne"
 (10.9) "hîn havîne" < "hêj havîne"

1.2.e. Veguherîna "e" yê bo "a" yê:

Di xebata xwe de me dît ku tîpa "e" yê ya paşdaçekên "re, ve, de" yê bûne "a" û wekî "ra, va, da" tên bikaranîn.

- (1.3) "Me xwe ra" < "Me ji xwe re"
 (1.19) "mala me da" < "di mala me de"
 (2.4) "kîrkîrka va" < "bi kirkirkan ve"
 (1.22) "isa xaş" < "wisa xweş"
 (5.27.) "xatirê xwe dixastîn" < "xatirê xwe dixwestin"

(6.2) "xasiya bûkê ra" < "ji xwesûya bûkê re"

(16.45) "te bihar nedikir" < "te bawer nedikir"

1.2.f. Veguherîna "u" yê bo "i" yê:

Di xebata xwe de em rast lê hatin ku di van nivîsên jêre de dengdêra "u"yê cihê xwe daye dengdêra "i"yê:

(1.11) "tas mas tinebûn" < "tas mas tunebûn"

(5.46) "ti li ber perda kûrê xwe rûnê" < "tu li ber perda kurê xwe rûnê"

(7.3) "di cara didotîn" < "du caran didotin"

1.2.g. Veguherîna "û" yê bo "a"yê:

Di metnan de me dît ku di devoka Çaldiranê de gihaneka "û" qet nayê bikaranîn û li şûna vê gihanekê carinan dengdara "a"yê tê bikaranîn.

(1.5) "dişûştin, dikirinê a hestîkî ga iha mezin davêtinê" < "dişûştin, dikirinê û hestiyekî ga wiha mezin"

(1.20) "D'en a hestîkî t'çerîkî davêtine navê" < "Den û hestiyekî terîkî davêtine navê"

(3.3) "arlon tinebû a hildan dibirin" < "arlon tunebû û hildidan dibirin"

(4.7) "derê mala xweyê wê a sibetirê xwe ra radixiştin" < "derê mala xweyê wê û sibetirê ji xwe re radixistin"

(4.8) "b^celgîk bîya a jê ra girê didan" < "belgiyek bîya û jê re girê didan"

(4.16) "berdane qazocaxiyê a iha iha dikirin" < "berdidane qazocaxiyê û wiha wiha dikirin"

(4.21) "sergirtî a iha eva dîwara tine, ev jî hewş e" < "sergirtî û wiha ev dîwar tune, ev jî hewş e"

(4.23) "dişûştin a yek jî dadidan" < "dişûştin û yek jî dadidan"

(5.11) "nedibirin a tîn, dimîne hetanî pazde roja" < "nedibirin û tîn, dimîne heta panzdeh rojan"

(5.17) "en hindîk sî bû a dest digirtin" < "herî hindîk sî bû û dest digirtin"

(5.18) "dihatîn a radibûn dêrek ciya bûkê ra" < "dihatîn û radibûn dêrek ji ciya bûkê re"

(5.20) "tinebû a hine şekilme, hine êmîş" < "tunebû û hinek şekilme, hinek êmîş"

(5.21) "a qîza zengîna bûya radibûn çar pez" < "û qîza zengînan bûya radibûn çar pez"

- (5.25) "zerf merf tinebûn a bela dikirin" < "zerf merf tunebûn û belav dikirin"
- (5.28) "çil-pêncî kavir a welle bûk mal dedixistin" < "çil-pêncî kavir û welle bûk ji malê derdixistin"
- (5.32) " hildan dibirin a berbi pêşve dihat" < " hildidan dibirin û berbû pêşve dihat"
- (5.36) "Danîn, dağanîn a xûşkê bûkê, mala apê bûkê" < "Dianîn, dadinîn û xwişkên bûkê, mala apê bûkê"
- (5.38) "xêliya bûkê ye a îja gevez davîtine pêra" < "xêliya bûkê ye û îja gevez diavêtine pêra"
- (5.45) diçûn a danîn vira" < "diçûn û dianîn vira"
- (7.1) "diçêriya a pêşiyê bex dihatine malê" < "diçêriya û pêşiyê berx dihatine malê"
- (7.7) "berodan a idî berodan nedihatê malê" < "berodan û êdî berodan nedihate malê"
- (7.11) "kereng diçandin a tişt miştê iha" < kereng diçandin û tişt miştên wiha"
- (8.4) "dixistine tûra da a îja zivistanê danîn" < "dixistine tûran û îja zivistanê dianîn"
- (8.5) "şor bû jî a genim berdidanê" < "şor bû jî û genim berdidanê"
- (8.7) "diqeliya a vala dikirin" < "diqeliya û vala dikirin"
- (9.1) "Gore dağanîn a guşîlek dikirine destê xwe" < "Gore dianîn û guşîlek dikirine destê xwe"
- (9.3) "gora da a binê yekî da guşîl dihiştin a yekî radikir" < "di goreyan de û di binê yekê de dihiştin û yekî radikir"
- (9.4) "digo eva destegulka mi a îja digo" < "digot ev destegulka min û îja û îja digo"
- (10.8) "Hêşîn nedibû a genimê payîzê jî" < "Hêşîn nedibû û genimê payîzê jî"
- (10.13) "bi hemdê xwe dediket a genimê biharê jî" < " bi hemdê xwe derdiket û genimê payîzê jî"
- (10.14) "tapanek lê dixistin a piştî wê dima" < "tapanek lê dixistin û piştî wê dima"
- (10.18) "dihatê dirûnê da a hine herêma berê bi dasê didirûtin" < "dihate dirûnê da û hinek herêman bi dasê didirûtin"
- (10.24) "ew dibû dezgākî a îja wî çaxî didirûtin" < "ew dibû dezgayekî û îja wî çaxî didirûtin"
- (10.33) "xweyî dikirin a ka xwe" < "xweyî dikirin û kaya xwe"
- (10.41) "isa ret dibû a genim hûr dibû" < "wisa ret dibû û genim hûr dibû"
- (10.43) "ew tiştêkî cuda bû a savarê xwe jî hildidan" < "ew tiştêkî cuda bû û savarê xwe jî hildidan"
- (11.1) "zêde dirêj nebû a serê wan jî dar bû" < "zêde dirêj nebû û serê wan jî dirêj bû"

(12.1) "ar dîkîrin a zar xwe ra digihîştin hev" < "ar dikirin û zar ji xwe re digihîştin hev"

(12.5) "bereket zêde dibe ça dibe a îja dihatin derê mala" < "bereket zêde dibe çawa dibe û îja dihatin derê malan"

(13.5) "xwe digihandine cûcîkên mele a wan didan" < "xwe digihandine cûcîkên mele û li wan didan"

(13.6) "ew dişewûştin a dor dibû ya koma dinê" < "ew dişewitîn û dor dibû ya koma dinê"

(14.5) "dajon a yên din jî" < "diajon û yên din jî"

(15.1) "qîsmekî wî dişûştin a ziha dîkîrin a heçî yên mala wan" < "qîsmekî wî dişûştin û ziha dikirin û heçî yên mala wan"

(16.2) "xûşka wî bîye a apêkî wî bîye" < "xwişka wî bûye û apêkî wî bûye"

(16.50) "mecbûr man mêr kîrin a diya Miştaqê apê mi" < "mecbûr man mêr kirin û diya Miştaqê apê min"

(16.60) "wira nîne a digo, Biro çûye" < "li wir nîn e û digot Biro çûye"

(16.62) "be bexê xwe ye a go bi wî awayî" < "ber bexê xwe ye û digot bi vî awayî"

(16.65) "emrê yekî heyjde sal e a îsal" < "emrê yekî heyjdeh sal e û îsal"

1.2.h. Veguherîna Dengdêr û Degdarên Cînavkên Kesane

Di devoka Çaldiranê de me dît ku hin cînavkên kesane yên tewandî û xwerû li gorî kurmanciya nivîskî cuda ne:

Kurmanciya Nivîskî (c.x):	Devoka Çaldiranê (c.x)
Ez	E (16.107)"e çûme Balikesîrê"
Tu	ti (16.107)"ti wî bizvirînî"
Ew	Ew
Em	Em
Hûn	Wun (16.22) "Wun ê binêrin"
Ew	Ew

Cînavkên kesane yên tewandî yên devoka Çaldiranê li gorî yên xwerû kêmtir guherîne. Cînavka "min" bûye "mi" (19.13) "delalya mi lawo", "wan" bûye "wana" (10.21) "çawê wana".

Di kurmanciya nivîskî de cînavkên şanîdanê gava ku qertafên tewangê digirin dengdêra serê wan dikeve, lê di devoka Çaldiranê de ev dengdêra navborî nakeve.

(4.32) "ber ewê tijî dikir" < "ber wê tijî dikir"

(13.4) "ewî gazî dikir" < "wî gazî dikir"

1.3. Ketina Dengdêran

Ji ber sedemên curbecur, ji ketina kîteyekê ya ji peyveke ku ji du kîteyan bêtir re ketina dengdêran tê gotin.⁴³

1.3.a. Ketina Dengdêra "i"yê:

Di wan nivîsên jêr de me dît ku dengdêra "i" di hin lêkeran de gava ku lêker qertafên "di-" û "bi-" yê digirin; di hin bêtir de jî ji kîteya navîn dikeve:

(10.30) "kêvrê mezin" < "kevîrê mezin"

(11.36) "qalkê wê" < "qalikê wê"

(10.44) "wê qulkê ra" < "ji wê qulikê re"

(1.9) "davêtine" < "diavêtine"

(4.31) "dajot" < "diajot"

(10.25) "dizvirî" < "dizivirî"

(10.39) "hev ra bigrinê" < "bi hev re bigirinê"

(10.40) "he merva" < "her merivan"

(16.9) "kalkê mi" < "kalikê min"

(16.13) "digrin" < "digirin"

(16.15) "berya wê" < "beriya wê"

(16.40) "e nemrime" < "ez nemirime"

(16.42) "pîrka mi" < "pîrika min"

(16.43) "nava wê berkê da" < "di nava wê berikê de"

(16.58) "bîne were" < "biîne were"

(16.63) "nehya midirî" < "nehiya midirî"

(16.64) "emrê yekî" < "emirê yekî"

(16.79) "eskerya xwe" < "eskerya xwe"

(18.3) "serê hev dişikêandin" < "serê hev dişikêandin"

⁴³ Sadettin Özçelik, Erdoğan Boz, *Diyarbakır İli Çüngüş ve Çermik Yöresi Ağzı*, TDK Yayınları, Ankara 2001, s. 75.

- (19.7) "xew da bigre" < " di xew de bigire"
- (19.9) "bêjne diya mi" < "bêjine diya min"
- (19.13) "bavê te nel mal e" < "bavê te ne li malê ye"
- (19.19) "qedrekî nêvanê bavê xwe" < "qedirekî mêvanê bavê xwe"
- (19.20) "bikşîne tewlê" < "bikişîne tewleyê"
- (19.40) "yataxê de dibriqe" < "di yataxê de dibiriqe"
- (19.49) "destê wan da qêrya" < "di destê wan de qêriya"
- (19.54) "mala te şewiyo" < "mala te şewitiyo"
- (19.56) " teze bigrî çend pere dikê" < "teze bigirî çend pere dike"
- (19.58) "ji piyê wî dikşe" < ji piyê wî dikişe"
- (19.59) " sar bin" < "siwar bibin"
- (19.64) "ti bimirî" < "tu bimirî"
- (19.65) "destê te naghîjê" < destê te nagihîjê"

1.3.b. Ketina Dengdêra "e"yê:

Di metnan de xuya bû ku, di wan nivîsên jêr de, veqetandeka nebinavkirî gava tê ber navdêreke ku bi dengdêrê qediya ye, "e" dikeve:

- (4.8) "b^celgîk bîya" < "belgiyek bûya"
- (3.6) "dêrekî ciya bûkê ra" < "dêreyek ji ciya bûkê re"
- (5.30) "qutîk bû" < "qutiyek bû"
- (10.20) "palê xwe" < "paleyên xwe"
- (10.28) "alîkî diçû" < "aliyekî diçû"
- (10.38) "bistîk çêkiribûn" < "bistiyek çêkiribûn"
- (16.31) "masekî danîbûn" < "maseyek danîbûn"
- (16.71) "navçêke wê" < "navçeyeke wê"
- (16.84) "agahîkî bistînim" < "agahiyekê bistînim"
- (19.10) "pêkî wê" < "pêyekî wê"
- (19.18) "şalpeke entabê" < "şalpeyêke Entabê"
- (19.20) "bikşîne tewlê" < "bikişîne tewleyê"
- (19.35) "haşîne se sifrê" < "hatine ser sifreyê"
- (19.66) "Bide axakî" < "Bide axayekî"
- (1.6) "hestîkî ga" < "hestiyekî ga"
- (16.72) "eqrabekî" < "eqrabeyekî"
- (2.2) "nermê dîwêr" < "nermeyê dîwêr"

- (4.28) "carke hemû " < "careke hemû"
 (5.19) "perçe milikê" < "perçeyê milikê"
 (5.35) "se hinê" < "ser hineyê"
 (5.49) "hemû xanîk bû" < "hemû xaniyek bû"
 (8.6) "pînek didane destê xwe" < "pîneyek didane destê xwe"
 (9.2) "hindirê gora" < "hindirê goreyan"
 (10.23) "digotin dezgák e " < "digotin dezgayek e"

1.3.c. Ketina "î"yê:

Di van nivîsên jêr de me dît ku veqetandeka nebinavkirî "-ek" gava ku tê ber peyveke bi dengdêra "î"yê qediyaye, dengdêra "î" dikeve:

- (4.12) "qazocaxêk" < "qazocaxiyek"
 (5.29) "şîrnayê dikirin" < "şîrînayê dikirin"
 (10.7) "nîzka berf bikeve" < "nêzîka berf bikeve"
 (16.18) "walî dikeve" < "wî alî dikeve"

1.3.ç. Ketina "a"yê:

Di metnan de xuya bû ku, di van nivîsên jêr de veqetandeka binavkirî gava tê ber navdêreke ku bi dengdêrê qediya ye, "a" dikeve:

- (16.8) "birê kalkê mi" < "birayê kalikê min"
 (19.33) "axê me ti yî" < "axayê me tu yî"
 (19.36) "mi xwe nevētiye mala te" < "min xwe neavētiye mala te"
 (19.63) "her sê birê Xezalê" < "her sê birayên Xezalê"
 (10.34) "ka xwe" < "kaya xwe"
 (16.35) "wan çiyay" < "wan çiyayan"

1.3.d. Ketina "ê" yê:

Di metnan de xuya bû ku, di van nivîsên jêr de veqetandeka binavkirî gava tê ber navdêreke ku bi dengdêrê qediya ye, "ê" dikeve:

- (19.79) "Malxê be mala mi" < "Malxêyê ber mala min"
 (19.62) "des pê wî" < "dest pêyê wî"

1.3.e. Ketina Kîteyan

Di xebata li ser devoka Çaldiranê de, me dît ku qertafa dema niha "di-" û pêşgira raweya fermanî "bi-" û di hin hokeran de jî hin kîte, dikevin.

(1.4) "dîzeke a hinde" < dîzeke wiha hinde"

(3.4) "hildan dibirin" < "hildidan dibirin"

(4.15) "qazyax berdanê" < "qazyax berdidanê"

(5.4) "bêje na " < bibêje na"

(5.9) "hildin diçin" < "hildidin diçin"

(10.32) "ça mi hêca anî ziman" < çawa min hêca anî ziman"

(10.44) "didane se siya da" < "didane ser stûya"

(10.35) "ka jî sakîne" < ka jî wisa ku"

(13.3) gazî wan ke" < "gazî wan bike"

(13.8) "li yekî wan xista" < "li yekî wan bixista"

(14.4) "em çakî diçînin" < "em ku çawa diçînin"

(16.34) "go îja" < "digot îja"

(16.39) "xilas ke" < "xilas bike"

(16.44) "cîkî dinê" < "cihekî dinê"

(16.54) "gora bavê Biro nim" < "gora bavê Biro binim"

(16.57) "talan ke" < "talan bike"

(16.67) "mezin bin" < "mezin bibin"

(16.81) "yekî bine me" < "yekî bidine me"

(16.82) "qeyd kîn" < "qeyd bikin"

(16.85) "dêna xwe dinê" < dêna xwe didinê"

(19.2) "xeber de" < "xeber bide"

(19.12) "deyn Xezalê kîm" < "deng Xezalê bikim"

(19.16) "mêze ke" < "mêze bike"

(19.21) "li dinê ye" < li dinyayê ye"

(19.24) "ne dixwe çayê ne dixwe qawê" < "ne vedixwe çayê ne vedixwe qahweyê"

(19.25) "siyar ke" < "siyar bike"

(19.28) "kerem ke" < "kerem bike"

(19.29) "ti zani" < "tu dizani"

(19.30) "pišta te kîm" < "pišta te bikim"

(19.31) "yê li te xin" < "yê li te bixin"

(19.37) "mêr ke" < "mêr bike"

- (19.38) "xayî ké" < "xayî bike"
 (19.39) "ç^cevê wî çadirê keve" < çevên wî çadirê bikeve"
 (19.42) "dezmêja nîvro" < "destnimêja nîvro"
 (19.50) "se pişta mi^cînê keve" < ser pişta miⁿînê bikeve"
 (19.52) "em ê bar kîn" < "Em ê bar bikin"
 (19.55) "Bê reyîso" < Bibêje reyîso"
 (19.71) "kalî diçin" < kîjan aliyê diçin"
 (19.72) "girê de" < "girê bide"

1.4. Lêzêdebûna Kîteyan

Ew bûyera ku ji ber têkiliya peyvan a bi hev re an jî ji bingeha peyvan pêk tê, lêzêdebûn e.⁴⁴

Di xebata xwe de di nivîsên jêrê de me dît ku di hin peyvan de kîte li peyvê zêde bûye. Ev peyvên navborî ev in:

- (7.8) "mîtanî seyrane^{kê}" < mîna seyrane^{kê}"
 (5.50) "hetanî pazde roja" < "heta panzdeh rojan"
 (16.55) "hemû^{kî} bixwe" < "hemû bixwe"

1.5. Tewanga Navdrên Nêr

Di kurmanciya nivîskî de navdrên nêr û yên ku di kîteyên wan de tîpa "e" an jî "a" hene bêyî ku tewanga nêr "î" yê bigirin ditewin. Me di xebata xwe de dît ku di devoka Çaldiranê de navdrên ku bi vî awayî ditewin zêde ne. Ev navdrên navborî ev in:

- (2.1) "goştê diwêr" < "goştê dewar/dewarî"
 (4.3) "devê çêm" < "devê çem/çêm/çemî"
 (7.5) "çiyê" < çiya/çiyê/çiyayî
 (7.6) "pêz" < "pez/pêz/pezî"
 (16.6) "zavê" < "zava/zavayî"
 (19.26) "nîn" < "nan/nanî"
 (19.61) "heywîn" < "heywan/heywanî"

⁴⁴ Günay Karaağaç, *Türkçenin Dil Bilgisi*, Akçağ Yayınları, Ankara 2013, 2. Basım, s.141.

2. Dengdarên Devoka Çaldiranê

Me di vê xebata xwe de dengên ku di devoka Çaldiranê de hene lê belê ji bo wan di alfabeya nivîskî de tu nîşane nehatine danîn, tespît kirin û taybetmendiyên wan diyar kirin. Di devoka Çaldiranê de ji bilî bîst û sê dengdarên (b, c, ç, d, f, g, h, j, k, l, m, n, p, q, r, s, ş, t, v, w, x, y, z) ku di alfabeyê de hene, dengên dengdar ên wekî " ç, p, x, h, k, t, r" jî hene. Di xebata xwe de me peyvên ku bi van dengan hatine nivîsîn, tesbît kirin, nivîsîn û bi sîstema transkrîbsiyonê ya navneteweyî jî nîşan dan.

- b** wekî *bar*, [b]
- c** wekî *cîran*, [dʒ]
- ç** dengê hilmî ye, wekî *çar*, [tʰ]

2.1.a. Dengdara ç

ç Dengê nehilmî û qirikî ye, wekî *çira*, [tʰ]. Di devoka Çaldiranê de em di nava van peyvên de li rastî vî dengî hatin: (1.11) tas mas tine bûn çingo mingo, devê (4.37) çêm, (5.19) perçê milîkê, (7.1) diçêriya, (10.46) genim çîl nade, (19.102) Çiqa çek, (4.38) tîpê piçûk, (16.35) wan çiyar, (1.31) kevçiyê dar, (5.51) laçîk maçîk, (16.108) çikanê sax hene, (16.109) yekî çeloyî kir, (19.03) ji çevê Dewrêş haç, (19.104) heçî kesê, (16.110) çermê ser.

- d** wekî *diran* [d]
- f** wekî *firavîn*, [f]
- g** wekî *gewr*, [g]
- h** wekî *havîn*, [h]

2.1.b. Dengdara h

h Dengekî hişk a qirikiya xişinî ye, wekî *hemû*, [h̥]. Di devoka Çaldiranê de em di nava van peyvên de li rastî vî dengî hatin: (1.14) Bîst hevê me, (4.1) "me hemûka hev digirt, (16.49) her dîka, (5.42) "bûkê hij wê mêrikî nekira, (16.70) piştî hebsê, (16.66) heyjde, (16.4) " milîsan hemûk, (10.2) "hetta, (16.86)"he ro he ro, (1.23) "ho rovî dikirine nava girarsibê, (19.41) "Bedela xûna di hezar mêra, (16.53) " e hemêz kîrim, (16.16) " Miheme, (17.1) "pên şeş hev, (19.60) "hevde, (4.25) " heft rênberê me, (14.1) " yêmê heywana, (19.48) "he ker lala, (5.34) "digo werine se hinê, (4.39) ev jî hewş e, (5.53) dimîne hetanî, (10.13) "bi hemdê xwe, (1.23) ho rovî, (2.7) helîse, (5.54) dibirine himamê, 10.13)bi hemdê, (10.47) rûn dihelandin xwe, (10.48) hemla xwe datînîn, (16.7)rojêkî rihmetiyê(16.111) me ra heram e, 16.112) yekî jî hacî bîye, (16.113) sîlahê giran, 16.114) hal mesele, (16.115) Sidîqê heso, (16.116) taseke me ya herî hebû, (16.117) yekî hemoyî kir, (16.118) çokê Miştâq neherîşe, (16.63)nehyâ midirîk, (16.119) hebsê da dimînin, (16.120) kûrapê wî yê helal, (16.121) pê dihise, (17.2) jê ra digotin hoşk, (19.103) hizûra dewrêş Begê, (19.104) îsirheta xwe, (19.105) Xezal hişyar, (19.106) dêrekî helebê, (19.107) bîke hurmeta, (19.108) xwe hezkiriye, (19.109) Jina mêrike nikahî, (19.110) mihafiz, (19.111)bû hokîniya vî şivanî,

j wekî *jîjo*, [ʒ]

k dengekî hilmî ye, wekî *kesk*, [k^h]

2.1.c. Dengdara k

k Dengekî nehilmî û qirikî ye wekî *kadîn*, [k^s] Di devoka Çaldiranê de em di nava van peyvên de li rastî vî dengî hatin: (3.7) "orxanek nebiya xwe ra, (6.4) "sertêdana bûkê, (16.45) "te bihar nedikir kû jin e, (4.1) "me hemûka hev digirt",(16.49) "her dîka, (5.42) "bûkê hij wê mêrikî nekira, (5.7) " desmalekî tînin, 16.51) "çokê Miştâq, (7.8) "mîtanî seyraneke, (16.56) "nekujim, (7.12) "cake didotin denakevim, (2.6) "Ê keledoş jî keşk bû, (19.7) "cote kar", (1.21) "girareke isa xaş, (19.5) "qaweke destê Xezalê, (2.4) "aha kirkirka va se helîse werdikirin, (5.9) "kûrapê xwe", (16.28) "sê eskera, (4.24) "Xurekê pala, (9.5) " destegulka mi, (16.76) "kûrê dêkî ne, (19.11) "şûrekê destê da ne, (19.23) "sîw sê biskê xwe.

- l** wekî *law*, [l]
- m** wekî *mam*, [m]
- n** wekî *nan*, [n]
- p** dengekî hilmî ye, wekî *pir*, [p^h]

2.1.ç. Dengdara p̂

p̂ Dengekî nehilmî û qirikî ye, wekî *pîşt*, [p^s] Di devoka Çaldiranê de em di nava van peyvan de li rastî vî dengî hatin: (16.70) "pîştî hebsê, (5.22) "pez şer jê dikirin, (17.1) "pên şeş hev, (7.2) "pêşiyê bex dihatine malê, (5.12) "pazde roja, (16.29) "qetliyam des pê dîke, (5.36) mala apê bûkê, (5.38) "xêliya bûkê ye a îja gevez davîtine pêra, (7.1) "diçêriya a pêşiyê bex dihatine malê, (10.8) "Hêşîn nedibû a genimê payîzê jî, (2.6) Ê keledoş jî kêşk bû, spîtang bû, (4.38) tîpê piçûk, (5.4) bêje na dibêje peyî, (5.33) berbi pêşve dihat, (10.14) taşanek lê dixistin, (10.45) ser dipêtin, (16.42) pîrka mi go,

- q** wekî *qelûn*, [q]
- r** dengekî hejok û di destpêka peyvan de cih nagire wekî *mirov*, [r]

2.1.d. Dengdara r̂

r̂ Dengekî lertzok e; hemû "r" yên destpêka peyvan lertzok in. Wekî *rê[r]*. Di devoka Çaldiranê de em di nava van peyvan de li rastî vî dengî hatin: (3.7) "orxanek nebiya xwe ra, (5.31) (16.86) "he ro he ro, (1.10) "em se rûdiniştin, (1.23) "ho rovî dikirine nava girarsibê, (5.47) "rûnê înşalla", (5.24) "mêrika radibû, (19.74) "rêya sê qonaxa, (16.33) "ras dikirin, (10.41) "isa ret dibû a genim hûr dibû, (1.9) Davêtine tendûrê, 29 t̂erîkî, (3.9) filankesê razaye, (3.2) hine mewûj, cote gorê rîs çedikirin, (4.24) heft rênberê me hebûn, (5.18) dihatin a radibûn, (10.49) rengê wî, (10.50) rêx neke, (10.51) radixistin, (10.47) rûn dihelandin, (11.46) serad dikirin, (11.41) isa ret dibû, (16.7) rojekî rihmetiyê, (16.122) didirû, (16.123) hekekî alîkî diçûn, (16.124) resma apê min.

- s** wekî *Sînem*, [s]
- ş** wekî *şîn*, [ʃ]

t dengekî hilmî ye *telîs* [t^h]

2.1.e. Dengdara **ṭ**

ṭ Dengekî nehilmî û qirikî ye wekî *ṭu* [t^h]. Di devoka Çaldiranê de em di nava van peyvan de li rastî vî dengî hatin: (19.88) *têreke ṭerîkî*, (4.2) "dergîstî", (10.19) "ewnê xetxetî", (13.1) "ewna biparastana, (1.14) "Bîst hevê me, (4.30) "vîdonê hestîn, (6.4) "sertêdana bûkê", (16.45) "te bihar nedîkir ku jin e, (4.1) "me hemûka hev digirt, (4.6) "daînin derê mala xwe, (5.7) "desmalekî ṭînin, (5.48) "baltûza wê ra, (1.10) "em se rûdiniştin", (16.59) "Miştîq jî bîke be bexa, (7.12) "cake didoştin", (16.5) "çiqa ṭîştê bêexlaqî hebûn, (4.11) "ṭîştê tinebû, (19.7) "coṭe kar", (5.2) "em ê te ra bixazin, (19.5) "qawêke destê Xezalê, (19.77) "Xezalê bîştibe, (1.24) "goştê berana, (4.5) dikirine tûra, (4.25) "heft rênberê me, (5.5) "ṭî mêra dijberî, (7.10) "ṭîşt miştê iha, (8.2) "wextê bêdera, (9.5) "destegulka mi", (15.4) "çar si'eta", (16.25) "ewan zivîstana, (19.44) "çev zêra ket, (1.20) "D'en a hestîkî ṭerîkî davêtine navê, (4.7) "derê mala xweyê wê a sibetirê xwe ra radixiştin, (4.21) "sergirtî a iha eva.

v wekî *varik*, [v]

w wekî *wawîk*, [w]

x wekî *xox*, [x]

2.1.f. Dengdara **ḫ**

ḫ Dengekî nerm û lerezok î zimanokî ye. Wekî *axa* [ɣ]⁴⁵ Di devoka Çaldiranê de em di nava van peyvan de li rastî vî dengî hatin: (19.43) "Bexdayê hêca ye, (19.65) "nagîje Mendol Axâ", (4.16) "berdane qazocaxiyê a iha iha dikirin, (10.24) "ew dibû dezgâkî a îja wî çaxî didirûtin, (1.18) Ça may tinebû Quran, şekirê Bayîzdaxa, (4.15) qazyax berdane, (5.55) Çaxê gustîl dikirin, (10.1) isa texmîn dikirin, (16.125) Textekoy jê ra dibêjin, (11.47) tabî saxlem çêkiribûn, (14.7) qereqilçix jê ra digotin, (16.32) kaxizekî xwe, (16.108) çîkanê sax hene tinene, (16.126) nîzka mexrebê bû, (16.127) li Ebexê hebûn, (16.128) Bayîzdaxa, (16.129) qaçax bû, (16.130) Şêx Cindî,

(16.131) Yekî xelqê Axiriyê, (16.132) ba{xê zeytûna, (19.112) kete oca{xê, (19.113) quntaxê tifingê, (19.114) çemê Bexdayê,

y wekî yar, [j]

z wekî zêr, [z]

		LI GORÎ CÎDERKÊ DENG DAR					
		Lêvk î	Diranlêv kî	Diran î	Pêşarî kî	Arikî,Qiri kî	Qirik î
LI GORÎ ŞEWYÊ DERKETINÊ DENG DAR	Fîzeka hişk		f	s	ş		
	Fîzeka Nerm		v	z	j		h
	Lerzokî				r, r̄		
	Girtiya Nerm	b		d	c	g	
	Girtiya Hişk	p, p̄		t, t̄	ç, ç̄	k, k̄	q
	Rexkî				l		
	Difinî	m		n			
	Domdara Hişk						x, x̄
	Nîvdengdê r	w			y		h

Şekil 6 - Tabloya Dengdarên Çaldiranê

2.2. Veguherîna Dengdaran

2.2.a. Veguherîna "b" yê bo "v" yê:

Di metnan de û di van nivîsên jêrê de dengdara lêvkî "b" di hin bêjeyan de veguheriye û cihê xwe daye dengdara diranlêvkî "v"yê.

(1.14) "Bîst hevê me" < "Bîst hebê me"

(3.7) "orxanek nebiya xwe ra" < "orxanek ji neviya xwe re"

(4.30) "vîdonê heştin" < "bîdonê hesin"

(5.13) "divê em herin" < "dibêje em herin"

2.2.b. Veguherîna "l"yê bo "r" yê:

Di metnan de, me dît ku di "raweya bilanî" de dengdêra "l" veguheriye "r" yê:

(10.26) "digo, bira nav da nemîne" < "digot bila di nav de nemîne"

2.2.c. Veguherîna "l" yê bo "t" yê:

Di vê xebatê de me dît ku di hin peyvên de dengdara "l" veguheriye "t"yê.

(6.4) "sertêdana bûkê" < "serlêdana bûkê"

2.2.ç. Veguherîna "h" yê bo "w" yê:

Di vê xebatê de û di van nivîsên jêrê de me dît ku, dengdara "h" yê cihê xwe daye "w"yê û cînavka kesê duyemîn yê pirjimar "hûn" jî veguheriye "wûn"yê.

(16.22) "wun ê biherin" < "hûn dê biherin"

(16.45) "te bihar nedikir kû jin e" < "te bawer nedikir ku jin e"

2.2.d. Veguherîna "y" yê bo "k" yê:

Di zimanê nivîskî de tîpên kelijandinê "h", "w" û "y" ne. Di vê xebatê de û di van nivîsên jêrê de em lê rast hatin ku ji bilî van her sê tîpên kelijandinê tîpa "k" jî ji kelijandinê re dibe:

(4.1) "me hemûka hev digirt" < "me hemûyan hev digirt"

(16.49) "her dîka" < "her duyan"

2.2.e. Veguherîna "z"yê bo "j" yê:

Di vê xebata li ser devokê de em lê rast hatin ku di kewyana hin kêteyan de dengdara "z"yê cihê xwe daye "j" yê:

(5.42) "bûkê hij wê mêrikî nekira" < "bûkê ji wî mêrikî hez nekira"

2.2.f. Veguherîna "d" yê bo "t" yê:

Di vê xebatê de û di van nivîsên jêrê de me dît ku de, di hin lêkeran de dengdara "d" veguheriye û bûye "t". Ev veguherîn carinanan di zimanê nivîskî de jî tê dîtin:

(4.6) "daînin derê mala xwe" < "dadînin derê mala xwe"

(5.7) "desmalekî tînin" < "destmalekî dînin"

(5.31) "bûkê ra daînan" < "ji bûkê re dadînin"

(5.48) "balûza wê ra" < "ji baldiza wê re"

2.2.g. Veguherîna "j" yê bo "c" yê:

Di vê xebata li ser devokê de em lê rast hatin ku, hin kêteyan de dengdara "j"yê cihê xwe daye "c" yê:

(19.43) "Bexdayê hêca ye" < "Bexdayê hêja ye"

2.2.ğ. Veguherîna "j" yê bo "ş" yê:

Di vê xebatê de em rast lê hatin ku di gihaneka "jixwe"yê de dengdara "j" veguheriye dengdara "ş"yê.

(4.10) "ew bû şixwe" < "ew bû jixwe"

2.2.h. Veguherîna "s" yê bo "z" yê:

Bûyera veguherîna "s" yê bo "z" yê di zimanê nivîskî de jî heye.⁴⁶

Veguherîna dengdara "s" û "z" yê hindik be jî di zimanê nivîskî de heye. Di vê xebatê de û di van nivîsên jêrê de em rastî van mînakên hatin:

(16.21) "naz dîkîn" < "nas dîkîn"

(19.42) "dezmêja nîvro" < "destnimêja nîvro"

2.2.i. Veguherîna "s" yê bo "ş" yê:

Di vê xebata xwe de em rast lê hatin ku, di lêkera hevedudanî "serjêkirin"ê de dengdara "s" yê cihê xwe daye dengdara "ş" yê.

(5.22) "pez şer jê dîkîrin" < "pez ser jê dîkîrin"

2.2.î. Veguherîna "m" yê bo "n" yê:

Di vê xebatê û di vê nivîsa jêrê de me dît ku dengdara "m" yê cihê xwe daye "n" yê:

(11.48) "pê nêvanê xwe rê dîkîrin" < "pê mêvanê xwe rê dîkîrin"

2.3. Lêzêdebûna Dengdaran

Ew bûyera ku di nav peyvê de gelek caran bêyî ku fonksiyona wê hebe lêzêdebûna yek an jî bêtir a dengdaran e.⁴⁷

⁴⁶ Celadet Bedirxan, Roger Lescot, *Kürtçe Dilbilgisi (Kurmançî)*, Doz Yayınları, İstanbul 2011, s. 36.

⁴⁷ Sadettin Özçelik, Erdoğan Boz, a.g.e. , s. 69.

2.3.a.Lêzêdebûna "y" yê:

Di vê xebatê û di van nivîsên jêrê de me dît ku dengdara "y" li peyvên zêde bûye:

(19.3) "herî yaliyê herêma xwe" < "herî aliyê herêma xwe"

(6.1) "ji boy sertêdana bûkê" < "ji bo serlêdana bûkê"

(19.13) "delalya mi lawo" < "delala min lawo"

(16.66) "heyjde" < "hejdeh"

2.3.b Lêzêdebûna "k" yê:

Di vê xebatê û di vê nivîsa jêrê de me dît ku dengdara "k" li peyvê zêde bûye:

(16.4) "milîsan hemûk" < "milîsan hemû"

2.4. Pevguherîn(metatez)

Ji cihguhertina du dengên di nav peyvê re pevguherîn (metatez) tê gotin.⁴⁸

Di vê xebatê de me dît ku di van peyvên li jêr de pevguherîn(metataz) çêbûye:

(4.2) "dergîstî" < "desgîrtî"

(20.1) "Dewrêş" < "Derwêş"

(4.26) "cînar" < "cîran"

(10.19) "ewnê xetxetî" < "ewên xetxetî"

(13.1) "ewna biparastana" < "ewan biparastana"

2.5. Dubarebûna Dengdaran (Şedde)

Li gorî rêzimana kurmancî, divê dengên ji hev û nêzî hev bi hev ve neyên nivîsandin û bilêvkin.⁴⁹

Li gorî qaîdeyên zimanê nivîskî divê di kurdî de "şedde" tunebe. Lê belê di vê xebatê de em rast lê hatin ku di van peyvên li jêrê de şedde heye:

⁴⁸ Gülden Sağol Yüksekaya, *Türk Dili Kitabı*, Kesit Yayınları, İstanbul 2012, s.110.

⁴⁹ Çetin Taş, *Waneyên Rêziman û Rastnivîsa Kurmancî*, Weşanên Dîwan, İstanbul 2013, r.22

- (10.2) "hetta" < "heta"
 (10.4) "bellî" < "belî"
 (12.4) "pezayîn" < "peyayîn"
 (5.3) "dibîne welle" < "dibîne weleh"
 (5.47) "rûnê însalla" < "rûnê însalah"

2.6. Ketina Dengdaran

Di nav peyvê de, ji ber tesîrên curbecur ên ketina dengdaran e.⁵⁰

2.6.a Ketina Dengdara "r" yê

Di vê xebatê de û di van nivîsên jêrê de me dît ku tîpa "r" yê ketiye:

- (16.86) "he ro he ro" < "her roj her roj"
 (1.10) "em se rûdiniştin" < "em ser rûdiniştin"
 (1.23) "ho rovî dikirine nava girarsibê" < "Hûr rûvî dikirine nava girarsibê"
 (5.14) "bûka xwe mal dexin" < "bûka xwe mal derxin"
 (7.2) "pêşiyê bex dihatine malê" < "pêşiyê berx dihatine malê"
 (7.9) "bexban, bex hildan dibir" < "berxban berx hildan dibir"
 (8.3) "nav da nem dibû" < "di nav de nerm dibû"
 (16.56) "nekujim denakevim" < "nekujim dernakevim"
 (16.59) "Miştaq jî bike be bexa" < "Miştaq jî bike ber berxan"
 (16.78) "dem debas dibe" < "dem derbas dibe"
 (18.2) "Gava berjêr dibûn" < "Gava berjêr dibûn"
 (19.41) "Bedela xûna di hezar mêra" < "Berdela xwîna du hezar mêran"
 (7.12) "cêke didotin" < "careke (dîn) didotin"

2.6.b. Ketina Dengdara "l" yê

Di metnan de û di van nivîsên jêrê de me dît ku tîpa "l" ya gihaneke "lê" yê ketiye:

- (2.6) "Ê keledoş jî kêşk bû" < "Lê keledoş jî keşk bû"

⁵⁰ Sadettin Özçelik, Erdoğan Boz, a.g.e. , s.70.

2.6.c. Ketina Dengdara "s" yê

Di metnan de û di van nivîsan de me dît ku tîpa "s"ê ya hin gihanekan ketiye:

(16.5) "çiqâ tiştê bêexlaqî hebûne" < "çiqaş tiştên bêexlaqî hebûne"

(16.46) "ewqa dengê mêra jê dihaş" < "ewqas dengê mêran jê dihat"

2.6.ç. Ketina Dengdara "b" yê

Di vê xebatê de û di van nivîsên jêrê de em lê rast hatin ku dengdara "b" yê ketiye:

(10.6) "xira dibû" < "xirab dibû"

(16.53) "e hemêz kîrim" < "ez hembêz kîrim"

2.6.d. Ketina Dengdara "d" yê

Di vê xebatê de û van nivîsên jêrê de me dît ku di hin peyvan de û bêtir jî di lêkerên alîkar de gava lêker qertafa "di-" ya dema niha digire, tîpa "d" dikeve:

(4.14) "şa dibûn" < "şad dibûn"

(10.13) "bilin dibû" < "bilind dibû"

(16.16) "Miħeme" < "Mihemed"

(16.17) "son xariye" < "sond xwariye"

(16.68) "çen cara" < "çend caran"

2.6.e. Ketina Dengdara "k" yê

Di metnan de û di van nivîsên jêrê de me dît ku gava veqetandeka nebinavkirî "-ek" tê navdêrekê dengdara "k" dikeve:

(1.7) "satile den dikuta" < "satilek den dikuta"

(3.2) "hine mewûj" < "hinek mewûj"

(4.11) "tiştê tinebû" < "tiştekan tunebû"

(10.5) "gele cara" < "gelek caran"

(10.15) "genim gere bihata avdanê" < "genim gerek bihata avdanê"

(19.7) "çote kár" < "cotek kar"

2.6.f. Ketina Dengdara "w" yê

Di metnan de û di van nivîsên jêrê de me dît ku di hin peyvan de û bêtir jî di pevdengan de dengdara "w" "w" dikeve:

(1.8) "iha mezin" < "wiha mezin"

(1.12) "Quranê se dixûnin" < "Quranê ser dixwînin"

(1.17) "dixar diçû" < "dixwar diçû"

(1.21) "girareke isa xaş" < "girareke wisa xweş"

(2.3) "aha bi kirkirka va" < "wiha bi kirkirkan ve"

(4.20) "Sîber loma ba, toz mozê" < "Sîber lewma ba, toz mozê"

(5.2) "em ê te ra bixazin" < "em ê ji te re bixwazin"

(5.27) "xatirê xwe dixastin" < "xatirê xwe dixwestin"

(5.37) "xûşkê bûkê" < "xwişkên bûkê"

(6.2) "xasiya bûkê" < "xwesûya bûkê"

(10.1) "isa texmîn dikirin" < "wisa texmîn dikirin"

(16.69) "xûna van çokên me" < "xwîna van çongê me"

(19.59) "melengê xwe sar bin" < "melengên xwe siwar bibin"

(19.75) "xazî mi bizaniya" < "xwezî min bizaniya"

2.6.g. Ketina Dengdara "h" yê

Di vê xebatê de û di van nivîsên jêrê de em rast lê hatin ku dengdara "h"yê ya hin lêker, jimare û hin peyvên ji erebî derbasî kurdî bûne, ketiye:

(5.3) "dibîne welle" < "dibîne weleh"

(10.17) "êdî 'îşk dibû" < "êdî hişk dibû"

(5.47) "rûnê însalla" < "rûnê însalah"

(16.41) "şazde" < "şanzdeh"

(16.66) "heyjde" < "hejdeh"

(19.5) "qaweke destê Xezalê" < "qahweke destê Xezalê"

- (19.60) "hevde" < "hevdeh"
 (19.65) "nagîje Mendol Axa" < "nagihîje Mendol Axa"
 (19.77) "Xezalê bîstîbe" < "Xezalê bihîstîbe"

2.6.ğ. Ketina Dengdara "n" yê

Di metnan de me di van nivîsên jêr de me dît ku, dengdara "n"yê ya qertafa tewangê ya pirjimar "an" û ya veqetandekê ya pirjimar "ên" ketiye:

- (1.15) "şivana ra vala dikirin" < "ji şivanan re vala dikirin"
 (1.24) "goştê berana" < "goştê beranan"
 (2.4) "aha kîrkîrka va se helîsê werdikirin" < "wiha bi kirkirkan ve ser helîsê werdikirin"
 (3.1) "Z^cedê zara" < "Zedê zaran"
 (4.1) "qîz, bûk hemûka me hev digirt" < "qîz, bûk hemûyan me hev digirt"
 (4.4) "bûka kulam digot" < "bûkan kulam digo,t"
 (4.5) dikirine tûra" < "dikirine tûran"
 (4.17) "çar hev sîberê me" < "çar heb sîberên me"
 (4.24) "Xurekê pala" < "Xurekê palan"
 (4.25) "heft rênçberê me" < "Heft rênçberên me"
 (4.26) "Cînarê me" < "cîranên me"
 (4.27) "kincê me" < "kincên me"
 (5.5) "ti mêra dijberî" < "tu mêran dijberî"
 (5.56) "merivê xwe" < "merivên xwe"
 (5.9) "kûrapê xwe" < "kûrapên xwe"
 (5.12) "pazde roja" < "panzdeh rojan"
 (5.24) "mêrika radibû" < "mêrikan radibû"
 (5.37) "xûşkê bûkê" < "xwişkên bûkê"
 (5.40) "hine mala" < "hinek malan"
 (5.41) "hij xinamiya nekira" < "ji hez xinamiyan nekira"
 (5.43) "hevşiya da peya dikirin" < "di hevşiyên de peya dikirin"
 (5.44) "siyara nan dixar" < "siyaran nan dixwar"
 (7.3) "di cara" < "du caran"
 (7.10) "tişt miştê iha" < "tişt miştên wiha)

- (8.1) " Bavo qeyneka" < "Bavo qeynekan"
- (8.2) "wextê bêdera" < "wextê bêderan"
- (9.2) "hindirê gora" < "hindirê goreyan"
- (9.5) " destegulka mi" < "deste gulka min"
- (10.9) " hê havînê" < "hîn havînê"
- (10.10) "hine herêma" < "hinek herêman"
- (10.12) "hine cîha" < "hinek cihan"
- (10.20) " palê xwe" < "palên xwe"
- (10.21) "çawê wana" < "çawên wan"
- (10.22) "çar kesa" < "çar kesan"
- (10.29) "dixistine çuwala" < "dixistine çuwalan"
- (10.37) "di kevira" < "du keviran"
- (11.2) "wan qîzana" < "wan qîzanan"
- (12.2) "derê mala" < "derê malan"
- (12.3) "derê goma" < "derê goman"
- (13.2) "hevalê wan" < "hevalên wan"
- (14.1) " yêmê heywana" < "yêmê heywanan"
- (14.3) "sê meha" < "sê mehan"
- (15.4) "çar siçeta" < "çar sietan"
- (16.3) "bi alîkariya milîsa" < "bi alîkariya milîsan"
- (16.10) "kalkê mi" < "kalkê min"
- (16.20) "wan kesana" < "wan kesanan"
- (16.23) "ewan eskerana" < "wan eskeranan"
- (16.24) "ewan sermana" < "wan sermanan"
- (16.25) "ewan zivîştana" < "wan zivîştanan"
- (16.27) "di şeva" < "du şevan"
- (16.28) "sê eskerana" < "sê eskeran"
- (16.30) "çar-pênc gunda" < "çar-pênc gundan"
- (16.36) "serê tivinga" < "serê tifingan"
- (16.41) "şazde salî" < "şanzdeh salî"
- (16.48) "tenê bi dara" < "tenê bi daran"
- (16.51) "çokê Miştîq" < "çongê Miştîq"
- (16.76) "kûrê dêkî ne" < "kûrên dêyekî ne"
- (16.77) "salê çilî" < "salên çilî"

- (16.83) "wan dera" < "wan deran"
- (18.1) "diçûn zozana" < "diçûn zozanan"
- (19.6) "sibe deyn xulama kîr" < "dengê xulaman kir"
- (19.08) "xezala li ku ye" < "xezalan li ku ye"
- (19.11) "şûrekê destî da ne" < "şûrek di destan de ne"
- (19.22) "se milê Xezalê" < "ser milên Xezalê"
- (19.32) "Gelekê serê xwe" < "Gelekan serê xwe"
- (19.34) "sifre, sinî kişiya odê" < "sifre sinî kişiyên odeyê"
" < "çev zêran ket"
- (19.45) "bi qirbaca hate Cilfaniyê" < "bi qirbacan hate Cilfaniyê"
- (19.48) "he ker lala" < "her ker lalan"
- (19.51) "di kelîma" < "du kelîman"
- (19.67) "di piya da" < "di piyan de"
- (19.68) "Bi dar çîdara" < "Bi dar çîdaran"
- (19.69) "e nedikeşime newala, keşime çuwala" < "ez nediketîme newalan ketîme çuwalan"
- (19.74) "rêya sê qonaxa" < "Rêya sê qonaxan"

2.6.h. Ketina Dengdara "t" yê

Di vê xebatê de û van nivîsên jêrê de me dît ku dengdara "t" yê ya hin peyv, lêker, hejmar û gihanekan ketiye. Her wiha dengdara "t" yê di zimanê nivîskî de jî ji gelek lêkeran ketiye.⁵¹

- (3.5) "desmalekê ji bûkê ra" < "destmalek ji bûkê re danîn"
- (5.34) "digo werine se hinê" < "digot werine ser hinê"
- (14.63) "bîs çar si'eta" < "bîst û çar sietan"
- (16.11) "qe nebe" < "qet nebe"
- (16.29) "qetliyam des pê dîke" < "qetliyam dest pê dîke"
- (16.33) "ras dikirin" < "rast dikirin"

⁵¹ Celadet Bedirxan, Roger Lescot, a.g.e. , s.35.

2.7. Kewyana dengdaran

Di vê xebatê de û di van nivîsên jêrê em li rastî kewyana van tîpên dengdar dîtin:

(16.52) "hate ce mi" < " hate cem min"

(1.2) "he ro he ro" < "her roj her roj"

(19.23) "sîw sê biskê xwe" < "sî û sê biskên xwe"



ENCAM

Me bi vê xebata xwe hewl da ku em dengên devoka Çaldiranê yên ku di alfabeya nivîskî de tunene -hebin jî ji bo wan nişane nehatibin danîn- tespît bikin û bûyerên wekî dubarebûn, ketin, veguherîn, kewyan, lêzêdebûn û pevguherîna dangan diyar bikin.

Ji bo ku em dest bi vê xebatê bikin, serê pêşîn em li dû wan kesan ketin ku zimanê wan zede asîmîle nebûbe. Paşê me ji van kesan, ew mijarên ku me berê diyarkirine, carinan jî çawa lê rast bihata, me qeyd girtin. Me mijar bêtir li ser *xwarinên berê, çûyîn û jiyana zozanan, lîstok, dawet, şahî, çandin, serpêhatî, çîrok* û hwd. hîlbijartin. Piştî ku me qeyd girtin me anî ev qeyd derbasî ser kaxîzê kirin. Di dawiyê de em li ser van metnan hûr bûn û em gihîştin vê encama ku me li jêr lê kiriyê:

1. Em di metnan de lê rast hatin ku, ji xeynî heyst dengdêrên zimanê nivîskî, pênc dengdêrên din jî hene. Piştî dahûrandina xwe, me dît ku ev dengdêrên navborî bi pîranî ji peyvên erebî derbasî kurmancî bûne. Lê belê hin bêjeyên kurdî yên ku bi dengdarê dest pê dikin, piştî ku dengdara destpêkê ketiye - weke *hişk/işk* - veguherîne van dangan û weke "eyna" erebî tîr xwendin.
2. Her wiha ji bilî dengdarên alfabeya nivîskî em li rastî hin dengdarên din jî hatin. Ev dengdarên navborî her çiqas di alfabeya nivîskî de hebin jî ji bo wan tîp nehatine diyarkirin. Ji van dengdaran;
 - a) Dengdarên "h" û "x" yê bêtir ji peyvên erebî derbasî kurmancî bûne lê belê bi domana demê re hin dengên ku di bîngeha xwe de kurdî ne jî ketine bin tesîra van dangan -ev yek bêtir di hejmaran de xuya dibe- û weke van dangan tîr xwendin,
 - b) Dengdarên "p, ç, t, k" yê jî di axaftinê de weke deng hene lê belê ji bo wan nişane nehatine danin. Ev yek jî dibe sedema pîrsgirêkan. Weke mînak nivîsandina *kar* (şîxul) û *karê* (bizina biçûk) mîna hev e lê belê wate û deng ji hev cuda ne.
3. Piştî ku me metnan xwendin me dît ku, di devoka Çaldiranê de daçek û pêşdaçek pîr kêmtîr tîr bikaranîn û her wiha paşdaçek bê pêşdaçek tîr bikaranîn. Paşdaçekên "re, "ve" û "de" jî wekî "ra, "va" û "da" tîr bilêvkirin. Mînak: (1.15) “şivana ra vala dikirin” < “ji şivanan re”

4. Di devoka Çaldiranê de di ravekê de, gava ku raveber veqetandeka pirjimar "-ên"ê werdigire, dengdara "n" dikeve. Her wiha veqetandeka nebinavkirî û pirjimar "-in" bêyî dengdêra nebinavkirî "hin"ê, li deverê hîç nayê bikaranîn. Mînak: (5.37) "xûşkê bûkê" < "xwişkên bûkê"

5. Veqetandeka nebinavkirî yekjimar "-ek" gava ku qertafa tewangê ya mê "ê" yê werdigire her tim vediguhere tewanga nêr "î" yê. Mînak: (16.7) "rojekî" < "rojekê"

6. Veqetandeka nebinavkirî û yekjimar gava tê ber navdêreke ku bi dengdêrê qediyaye, dengdêr dikeve û wisa bi navdêrê ve tê nivîsîn. Mînak: (19.10) "pêkî wê" < "pêyekî wê"

7. Qertafên tewangê gava bi navdêreke ku bi dengdêrê qediyane ve tînen nivîsîn, dengdêr dikeve. Mînak: Çû nexweşxanê < Çû nexweşxaneyê.

8. Dengdara "w" ya pevdengê gelek caran dikeve û dengdêra kurt "e" ya li dû wê tê jî dirêj dibe, dibe "a". Mînak: (1.21) "girareke isa xaş" < "girareke wisa xweş"

9. Raveber gava ku veqetandekê nebinavkirî digire gelek caran dengdara "k" ya veqetandekê dikeve. Mînak: (10.5) "gele cara" < "gelek caran"

10. Lêkereke hevedudanî gava ku qertafa dema niha "di-" yê werdigire, dengdara "d" yê ya beriya xwe dixê. Mînak: (10.13) "bilin dibû" < "bilind dibû"

11. Bi gelemperî dengdara "s" ya gihanekan ketiye. Mînak: (16.5) "çiqa tiştê bêexlaqî hebûne" < "çiqa tiştên bêexlaqî hebûne"

12. Dengdara herî zêde ketiye "r" ye. Ev dengdara navborî jî kîteya navîn û bêtir jî jî dengdara dawî dikeve. Mînak: He roj < Her roj.

13. Li gorî qaîdeyên zimanê nivîskî divê di kurmancî de "şedde" tunebe. Lê belê di vê xebatê de em rast lê hatin ku di devoka Çaldiranê de gelek peyvên bişedde hene. Gellek qîz û bûk < Gelek qîz û bûk.

14. Di gelek peyvên de pevguherîn (metatez) çêbûye.

15. Dengdara "y", "k" û "n" yê li gelek peyvên zêde bûne. Mînak: yaliyê > aliyê, hemûk > hemû.

16. Gelek dengdar û dengdêr veguherîne hevûdu.

17. Di kurmanciya nivîskî de navdêrên nêr û yê ku di kîteyên wan de tîpa "e" an jî "a" hene bêyî ku tewanga nêr "î" yê bigirin, jî nava xwe de ditewin. Me di xebata xwe de dît ku di devoka Çaldiranê de navdêrên ku bi vî awayî ditewin zêde ne. Mînak: (4.3) "devê çêm" < "devê çem/çêm/çemî"

18. Di hin peyvan de kîte li peyvan zêde bûne. Mînak: (7.8) "mîtanî seyraneke" < mîna seyraneke"

19. Di dema bê de gava ku lêker hevedudanî be, qertafa dema bê "bi-" bi gelemperî dikeve. Mînak: (13.3) gazî wan ke" < "gazî wan bike"

20. Veguherîna "e" yê bo "i" yê, zêdetir di jimareyên mîna sed û qatên wî de çêdibe. Mînak: (16.26) "du sid" < "du sed"

21. Di vê xebatê de me dît ku di demên borî de hin caran dengdêra "û" ya lêkera "bûn"ê vediguhere "î" yê. Mînak: (16.1) "bavê mi bîye" < "bavê min bûye"

22. Di xebata xwe de em lê rast hatin ku di gelek peyvan de dengdêra "u"yê cihê xwe daye dengdêra "i"yê: Mînak: (1.11) "tas mas tinebûn" < "tas mas tunebûn"

23. Di metnan de me dît ku di devok Çaldiranê de gihaneka "û" qet nayê bikaranîn û li şûna vê gihanekê carinan dengdêra "a"yê tê bikaranîn. Mînak: (11.1) "zêde dirêj nebû a serê wan jî dar bû" < "zêde dirêj nebû û serê wan jî dirêj bû"

24. Di xebata xwe de me dît ku li şûna lêkera "vexwarin"ê lêkera "xwarin"ê tê bikaranîn. Mînak: (4.40) "çay dixarin"

25. Di metnan de me dît ku di dema bê de û di cînavka kesê duyemîn a yekjimar de qertafa dema bê "ê" bi cînavkê ve dikelije û dibe "tê". Mînak: tê werî < tu yê werî.

26. Di zimanê nivîskî de cînavkên şanîdanê yên xwerû gava qertafên tewangê digirin, dengdêra wan ya destpêkê "e" dikeve. Lê belê di metnan de me dît ku di devoka Çaldiranê de ev dengdêr nakeve. Mînak: (4.32) "ber ewê tîjî dikir" < "ber wê tîjî dikir"

27. Di zimanê nivîskî de cînavkên şanîdanê yên xwerû weke "ev" û "ew" ê tên bilêvkirin. Lê belê me di metnan de dît ku li Çaldiranê ev cînavk gava ku tên bilêvkirin weke "eva", "ewa" tên bilêvkirin. Ev dengdêra ku li cînavkê zêde bûye "hokera şanîdanê"ye û li şûna "ev/wê ha" tê gotin. Mînak: (16.23) "ewan eskerana" < "wan eskeranan"

28. Di metnan de me dît ku daçeka "da" wekî fonksiyona "to" ya îngilizî peywira hokera berekê dileyîze. Mînak: (16.133) "tê Çaldiranê da", "He is coming to Çaldiran"

BEŞA SÊYEM

METNÊN NIMÛNE JI DEVOKA ÇALDIRANÊ

"Beriya ku em biçin cem wan me hinek mijarên ku em ê ji wan bipirsin diyar kirin. Ev mijarên jî ev bûn: *Çêkirina xwarinan, lîstok, serpêhatî, çûyîna aşî, cot, bênder, çûyîna zozanan, deniyê diranê zarokan, zedê zarokan, dawet, destgirtin û hineya bûkê.* Dûre me ev pirs ji kesên pîremêr û pîrejin kirin. Lê carinan jî pîrejin û pîremêr beriya ku em pirsan bi wan bikin diaxivîn û me jî axaftina wan nedibirî û dengê wan qeyd kir. Piştî vê pêvajoyê me deng bi baldarî guhdar kirin û ew jî derbasî rûpelan kirin. Paşê me li ser metnên ber destê xwe dest bi tespîtkirin û analîzkirina dangan kir. Ji bo dengên ku di zimanê nivîskî de tunene an hebin jî nîşaneyên wan tunene, me nîşane diyar kirin. Me ji bo her tîpên ku di alfabeyê de tunene, nîşaneyek diyar kir û di metnan de jî ev tîp diyar kirin.

NÎŞANEYÊN VEGUHESTINÊ

1. Dengdêr

a	: a
˘a	: a'ya eynî
e	: e
˘e	: e'ya eynî
ê	: ê
i	: i
˘i	: i'ya eynî
î	: î
˘î	: î'ya eynî
o	: o
u	: u
˘u	: 'u' ya eynî
û	: û

2. Dengdar

b	: b
c	: c
ç	: ç
ç̇	: ç'ya nehilmî û nerm
d	: d
f	: f
g	: g
h	: h
ḣ	: h'ya qirikî û zimanokî ye.
j	: j
k	: k
k̇	: k'ya nehilmî û nerm
l	: l
m	: m
n	: n
p	: p
ṗ	: p'ya nehilmî û nerm
q	: q
r	: r
ř	: ř'ya stûr
s	: s
ş	: ş
t	: t
ţ	: ţ'ya nehilmî û nerm
v	: v
w	: w
x	: x
ẋ	: ẋ'ya qirikî û zimanokî
y	: y
z	: z
...<	: forma devoka Çaldiranê
<...	: forma zimanê nivîskî/standart
(...)	: Di metnan de cihên ku nehatine fêmkirin.

Vebêj: Zahide Taş

Roja Ji Dayikbûnê: 1956

Rewşa Xwendinê: Nexwendî

Cihê Berhevkirinê: Navenda Çaldiranê

Berhevok: Girarsibe/ Helise/ Zedê Zaran

1 GIRARSIBE

Me 25 d^cenê xwe temîz dikuşa, me d^cenê xwe temîz temîz dikuşa, 1 he ro he 2 ro, cûnîyê me hebû. 3 Me xwe ra 7 satile d^cen dikuşa em 26 z^cef bûn. 4 Dîzeke a hinde, ew 27 dîzê herî hene dîz ha! 5 dişûştin dikirinê a 6 hestîkî ga 8 iha mezin davêtinê. 9 Davêtine tendûrê dikeliya, sîbê zû radibûn kodikê dimis hebûn tîjî dikirin tasê mezine hinde hebûn teyşt 11 tas mas tine bûn çingo mingo, 31 kevçiyê dar hebûn, kursî pê daran çedikirin 10 em se rûdiniştin. Ew kursiyên 12 Qurânê 13 se dixûnin. 14 Bîst 28 hevê me yê ji wê hebûn a ji 15 şivana ra vala dikirin teyşteke a hinde yê meçere mîs. Bûk jintî mintî dihatin kodikê xwe yê mîs tanîn, zarê wê z^cef bûna çar hesk dikirê, 30 dibir xwe ra. Her kesî diçû oda xwe 17 dixar diçû şixulê xwe dikir.

18 Ça may tinebû Quran, şekirê Bayîzdaşa 19 mala me da hebû, dikana me hebû. Hema goşt tenê hebû nava girarsibê da. 20 D^cen a hestîkî 29 t^cerîkî davêtine navê. Dibû 21 girareke isa xaş. 23 ho rovî dikirine nava girarsibê, goştê ga dewamlî hestiyê ga hinde, 24 goştê berana girarsibe dikeliya 22 isa xaş bû.

2 ҺELÎSE

7 Һelîse goştê diwêr dikirinê, 2 nermê diwêr dikirinê didane se Һendûrê hev didan, temîz kîrkîrk dikutan nava rûn da sor dikirin kîrkîrk ha! 3 aha 4 kîrkîrka va se Һelîsê werdikirin, rûdiniştin dixarin. 6 Ê keledoş jî keşk bû, spîtang bû tev dikirin.

3 Z^cEDÊ ZARA

1 Z^cedê zara mesela jinekî razaye we yê rabûya qatekî kinc zara wê ra bikiriya 2 hine mewûj, cote gorê rîs çêdikirin, 3 arlon tinebû a 4 hildan dibirin, digotîn bûka 9 filankesê razaye z^cedê wê laçikêk, 5 desmalekî jî bûkê ra danîn. Ku zengîn bûna ciya wê dêrekî ciya bûkê ra danî, dêre qîza xwe ra danî, 7 orxanekî nebîya xwe ra girê dida, 8 b^celgî girê dida, doşekî girê dida, z^cedê qîza xwe hilda danî.

Vebêj: Aynur TAŞ

Roja Ji Dayikbûnê: 1970

Rewşa Xwendinê: Nexwendî

Cihê Berhevkinê: Navenda Çaldiranê

Berhevok: Nivîngirêdan

4 NIVÎNGIRÊDAN

Nivîn me diçû ji qîz bûkî Һemûka me hev digirt mesela îro kûrê mi 2 dergîstîye, 1 me Һemûka hev digirt hiriya wî ereba dikir, berê 33 erebê ga hebûn, cêla keleska bûn. Me hiriya xwe lê dikir nanê xwe ça xwe xwerekê xwe hildida em diçûn devê 3 çêm, qîz 4 bûka kulam digot, hirî dikutan, kef dida 5 dikirine tûra ereba xwe dikirin, nanê xwe ça xwe diwarin, ereba dikirin danîn, 6 datînîn 37 derê mala xweyê wê a sibetirê xwe ra radixistin mitêla xwe danîn yek digirtin heqê wê didanê, çend orxan bîya doşekî bîya, 8 b^celgîkî bîya a jê ra girê didan 10 ew bû şixwe ya bûkê hema nivîn tenê bûn, 11 tişte tinebû. Hema cihêzê mi qutîk bû, 12 qazocaxekî

bû, em isa 14 şa dibûn. Digoştin qazocaxêk ji Zaydo ra kirîne. Qazocaxî 15 qazyax berdane 16 qazocaxiyê a iha iha dikirin cêla 38 tîpê piçûk serê wan hebûn agir pêdiket, çay didane se çêdikirin. Xurek, em bèn mala me giran bû mala me ya qazocaxiyê nebû.

17 Çar hev sîberê me hebûn, vira sîberê hebû, wira yek hebû, yekî se nan 34 dip^et, yek jî hema şev ro dikeliya serî kinc dişuştin. 20 Sîber loma ba toz mozê 21 sergirtî a iha eva diwara tine ev jî 39 hewş e, cêla kolîka 35 ^eeyne kolîka lê bê derî. Yek se 36 nan dip^etin, yek jî sîtil se bû şev ro bo se kinc dişuştin. Kincê kê qirêj bîya xwe ra satila xwe tijî ava kel dikirin, dibirin, 23 dişuştin a yek jî dadidan xurek se çêdikirin. 24 Xurekê pala yê malê. 24 heft rênçberê me hebûn poşmano dûrî seriya, 26 cînarê me hemû feqîr bûn hemûka diha firaqê me dişuştin, 27 kincê me dişuştin, loma nan bixwin çay bixwin. Nan, 40 çay dixarin êvarê diçûn mala xwe radizan sibê 28 carke hemû dihatin. roja îne gere telîsê şekirê pêncî kîloyê bihata îne heta îne pêncî kîlo şekir mala me, rênçberê me, cînarê me ret dibû. Îne heta îne ha pêncî kîlo danîn dihatin. rênçberêkî hema ava me dikişand, sirf av dikişand. Bi vîdona, 30 vîdonê heştin hene, se ^eerebê ga 31 dajot, dibir iha debo 32 ber ewê tijî dikir, ber kaniya Dêrê ber didayê danî, ew xulamê nav malê bû, ber destê malê bû. Qedo jî diha tepîk dikuşan, biharê parve dikir, payîzê jî xwe ra dibir.

Vebêj: Halime TAŞ

Roja Ji Dayikbûnê: 1955

Rewşa Xwendinê: Nexwendî

Cihê Berhevkinê: Navenda Çaldiranê

Berhevok: Destgirtin

5 DESŢGIRŢIN

Bavê gede ciya gede 1 dibên kuro me te ra qîza filankesê begem kîriye 2 em ê te ra bixazin. Gede jî dibê erê, ne gede qîzîkê dibîne ne qîzîk gede 3 dibîne welle. Qîzîk jî 4 bêje na dibêje peyî! 5 tu mêra dijberî 50 ^eeyb e, tiştê isa a tèn dest digirin, 6 guştîlekî, 7 desmalekî tînin dibên eva nîşaniya bûka me ye. Diçin rûdinên nan dixwin, şîva xwe dixwin, 56 merivê xwe 9 hildin diçin, sê- çar hev mêr kûrê xwe, 9 kûrapê xwe top dikin, diçin dest digirin a desmalekî, guştîlekî hildin, dibin, pê da dikin, hinek jî feqîr in, qe 11 nedibirin a tèn 53 dimîne heşanî 12 pazdeh roja 13 divê

em ê herin 14 bûka xwe mal dexin. Bûk idî mal dernayê. 55 Çaxê gustîl dîkirin tiliyê digotîn qelenê te çi ye? Sed kâvir bû pêncî kâvir bû sî kâvir bû 17 en hindîk sî bû a dest digirtîn, 18 dihatîn a radibûn 6 dêrek ciya bûkê ra îja digotîn eva 19 perçê milîkê, eva perçê mêzerê, gore, desmal, 51 laçîk maçîk wî çaxî 20 tinebû a hine şekilme hine êmiş dîkirine nav perçe hildan dibirin.

Eva malderxistîna wê ye 21 a îja qîza zengîna bîya radibûn çar 22 pêz şer jê dîkirin, mala bavê qîzîkê goşt, birinc çêdîkir îja 24 mêrikî radibû merivê xwe hildan diçûn. Îja wî çaxî dêre hebûn, hemûka dêre hildan, dibirin. Êmişê xwe dibirin, dîkirine mêzeran, dîkirine pêşa xwe bi destê xwe iha didane mîlet. Tas mas tinebû, dîkirine 25 zerf merf tinebûn a 26 bela dîkirin îja 27 xatirê xwe dixastîn, pênc pêz didane xatir, digotîn welle em xatirê xwe dixazin. Wî çaxî destgirtinê kifş e, mesela pêncî kâvir e, danîne se çil kâvirî, danîne se 28 çil pênc kâvirî a welle bûk mal derdixistîn, 29 şîrnayê dîkirin, diçûn idî ew ê jî nivînê xwe, destê nivîn bû, kulavek bû, 30 qutîk bû a hine tas mas bû 31 bûkê ra dağanîn welle bûk siyar dîkirin, 32 hildan dibirin a 33 berbi pêşve dihat, berbi dihat ew tine bû, de yê niha 54 dibirine himamê wî çaxî ewa tine bû.

Bûk mal da bû, berbi dihat îja bûkê serê xwe dişuşt, dihat rûdinişt îja ça may didan berbiyê, berbiyê hîna xwe dağanî îja yê 34 digo werine 35 se hîne, tişt mişt xêra xwe çi bûkê ra tanîn. 36 Danîn dağanîn a 37 xûşkê bûkê mala apê bûkê yan gazî kirina yê zêr bidanayê, dêre bidanayê, tişt bidanayê, fîraq miraq tinebûn. Êvarê berbiyê destê bûkê hîne dîkir, ciyê bûkê kêlekî xwe dağanî, piyê wê hîne dîkir. Destê xwe jî hîne dîkir, sibê zû radibû, desmaleke qîç, gevez hev va didirûtîn, 38 xêliya bûkê ye a îja gevez davîtine pê ra ya qîç davîtine parava a îja siyar dihatîn bûk hildidan îja 40 hine mala 41 hij wan xinamiya nekîra, 42 bûkê hij wî mêrikî nekîra dêla berbiyê jê dîkirin îja dibû eyb welle. Bona dêlê mêr dihatîne kuştin. Îja bûk hespê dîkirin, dibirin, hildan dibirin tewlê da, gomê da peya dîkirin, 43 hevşiya da peya dîkirin. heta 44 siyara nan dixar, 45 diçûn a danîn vira digotîn 46 ti li ber perda kûrê xwe 47 rûnê însalla. Em niha dibêjine hev jî da!em dibên ti ber perda kûrê xwe rûnê însalla, em niha dibêjine hev jî da. Li wira perde girê didan bûk zava vira radizan, tiyê wê wira, 48 baltûza wê wira, radiza ewa 49 hemû xanîk bû.

Vebêj: Sırice GÜNEY

Roja Ji Dayikbûnê: 1959

Rewşa Xwendinê: Nexwendî

Cihê Berhevkirinê: Navenda Çaldiranê

Berhevok: Kevneşopi/ Dawet

6 SERËDAN

1 Ji boy serêdana bûkê ciya bûkê dihat 4 serêdana bûkê. Ewê jî bêşî, kade îja a hinde bêşî kade çedikirin, hine mewûj, şekilme hildidan, dêrek 2 xasiya bûkê ra îja çote gorê rîs xezûrê bûkê ra yek mêrê bûkê ra, hine dêre kinc minc danî îja hebûya wan jî zêrek didayê, dêrek didayê, kiras, hevalkiras didayê, gore didanê îja mehekî dima îja lêdida diçû, Îja cînara laqirdî dikir digo, nehaîye serêdanê haîye navêdanê.

Vebêj: Seracettin Güney

Roja Ji Dayikbûnê: 1974

Rewşa Xwendinê: Nexwendî

Cihê Berhevkirinê: Navenda Çaldiranê

Berhevok: Çanda Pez Xwedikirinê

7 BERODAN

Sibê zû şeveqê pezê xwe berdidan, pez diçû çiya da 1 diçêriya a 2 pêşiyê bex dihaîne malê bexê xwe dixiştine hindir da paşê jî pez dihat ji çiyê dihat, pez dixiştine hindir da, pez didoşin, 3 di cara didoşin, carekî didoşin qasekî cake are dixiştinê da seva carke din şîr bikeve gihanê pêz da cara didiya 12 cake didoşin a bexê xwe berdidanê da, berdidane çolê da ji vê ra digoşin 7 berodan a idî berodan nedihate malê, idî qîz, bûk xwe ra rex hev diketin, diçûn çolê pez kîs dikirin, 8 mîtanî

seyranekê, pêz bexê xwe hev diqetandin, 9 bexban bex hildan dibir, şivan jî pêz dibir, îja ew qîz bûkana jî wira diçûne pincarê, diçûn tîrşo diçandin, 11 kereng diçandin a 10 tîşt miştê iha derdorê çî hebîya diçandin, xwe ra digeriyan dihaşine malê.

Vebêj: Nazime Eryıldırım

Roja Ji Dayikbûnê: 1959

Rewşa Xwendinê: Nexwendî

Cihê Berhevkinê: Navenda Çaldiranê

Berhevok: Xwarin

8 QEYNEK

1 Bavo qeyneka, qeyneka 2 wextê bêdera genimê xwe danîn dihaşin, genimê kirik danîn dikirine şîr da, di şîr da îja paşê genimê xwe dedixistin ziha dikirin, şîrê xwe temîz hildiçand, hildiçande xwe da, nav da 3 nem dibû, îja genim ber tavê radixistin, ziha dibû, genim ew çaxê ziha dibû, genimê xwe berav dikir, 4 dixistne tûra da a îja zivistanê danîn dihaşin genimê xwe dixistine hindirê sêlê, zivistanê bîya, payîz bîya ferq nedikir, kîjan zemanî dilê wan bixasta, danîn dihaşin sêla xwe didan ser tendûrê da, hindirê sêlê jî temîz temîz dikir, zaten genim nava şîr da xoya xwe jî hildabû, 5 şor bû jî a genim berdidane hindirê sêlê da 6 pînek didane destê xwe hema isa pê dibir dianî, genim tê da 7 diqeliya a vala dikirin, dibirin, dixarin. kîrkîrk hebîya kîrkîrk tev dikirin, dixarin.

Vebêj: Yaşar KOÇ

Roja Ji Dayikbûnê: 1971

Rewşa Xwendinê: Lîse

Cihê Berhevkinê: Navenda Çaldiranê

Berhevok: Lîstok

9 KUMGUSÎL

1 Gore dañinîn a gustîlek dikirine destê xwe, dixistine 2 hindirê 3 gora da a binê yekî da gustîl dihîştin a yek radikir, 4 digo eva destegulka mi, a îja digo, eva pûç eva pûç eva pûç e, binê kîjanê derkeşa dor dihaçe wî, ewî vedişart. Yanê gava bigoşa 5 destegulka mi heke gustîl binê wê dekeşa dor dihaçe wî, ewî vedişart.

Vebêj: Ali Îhsan Taş

Roja Ji Dayikbûnê: 1960

Rewşa Xwendinê: Dibistana Navin

Cihê Berhevkirinê: Navenda Çaldiranê

Berhevok: Çandin

10 GENIM

Genim kêrê çi tê? Genim her 1 herêmekî cudahiyeke wê hebû. Hinek herêma havînê dihaçe çandin da, hinek herêman da jî biharê, ew herêma ku serma wê 36 z^{ef} bûya wana biharê diçand. Herêma ku germa wê z^{ef} bûya jî wana jî havînê diçand, genimê payize digotin jê ra. 2 heştta genim sê qisma dihaçe çandin, yek qirame jê ra digotin, yek bihare jê ra digotin yek jî payize digotin. Qirame wextê ku payizê berf zeviya xwe radikirin, idî ku 7 nîzka berf bikeve idî 46 genim çîl nade, ew genim direşandine 37 ^{erdê} da, ew genim binê axê da dima diqerisî, biharê wî çaxê hewa xaş dibû ew genima bixwe xwe çîl dida, hêşîn dibû.

Eger ku piştî qermê germahî çêbûya, genim 6 xira dibû, genî dibû. Wî çaxî 1 isa texmîn dikirin ku îro genim davêjinê idî diqerise ^{erd ewk nabe}, isa wextê wana isa 4 bellî bû. Genim 5 gele cara xira dibû jî, genim davêtinê germ çêdibû, ew genim binê ^{erdê} da nem dibû, av diketê da, nîska çîldayînê da, paşê qerm se çêdibû ew genim xira dibû, sirê dibir. 8 Hêşîn nedibû a genimê payize jî, 9 hê havînê dihaçe çandinê da, 10 hine herêma direşandin, hine herêma jî dixistine tîr da, coşe tîr hebû, genimê xwe direşandin, genimê wana hêşîn dibû, genimê wana qasî 11 bihustekî, 12 hine cîha hê qasî di bihusta 3 bilin dibû îja payizê bex berdidanê, bex xweyî dikirin,

bex tê da xweyî dikirin, bex diçêriyan, heta ku berf ketinê da, idî berf ser da diket, ew çêra idî tam dibû çîm da binê 'erdê da. Berf ser da diket heta biharê, biharê idî 13 bi hemdê xwe derdiket a genimê bihare jî, ew jî hewla biharê zevî radikir, zeviya xwe, genimê xwe direşande 'erdê da, ser 'erdê 14 taşanekê lê dixistin a piştî wê dima heta havînê ew genimê tîr nedihate avdanê da, zaten ew genimê tîr ava xwe ji payîzê biharê hildida. hewciyê avê nebû.

Genimê qirame, genimê bihare ew he 15 genim gere bihaşa avdanê da, nehaşa avdanê ew genim çenedibû. Wextê avdana wê jî, genim me wî çaxî di av didanê, hinekan sê av didanê, genim wî çaxî teze hêşîn dibû, hinekî bilin dibû av didan, carke din jî genim ew çaxê dikeşe simbil da, simbil digirt wî çaxî av didanê da a hineka jî ciyê herêmê ku ava wan zêde bîya digo, em ê d'enavekî bidinê da, d'enaş jî ew wî çaxê he 49 rengê wî 16 zer nebibe, wî çaxî av didanê da ew jî digo, (10.38) d'enaş e, genim 39 d'en digirt, pey wê jî genim idî rengê wê zer dibû, piştî zerbûnê 17 idî 'işk dibû 18 dihaşe dirûnê da a hine herêmê berê bi dasê didirûştin, ew tîr bi dasê dihaşe dirûn da, ewnê xetxetî, genimê din jî bi tirpanê dihaşe dirûnê da, 20 palê xwe berav dikirin, genimê xwe didirûştin, yekî jî tîrmix dikir, yekî siyar dikir, bi dasê berav dikir dida ser, yekî jî 21 çawê wana hebûn, çaw rast dikirin, çaw rast dikire 'erdê, ew genimê ku dane ser çaw girê dida dibire partê. Bi 22 çar kesa pêk dihaş, jê ra 23 digotîn dezgâk e, 24 ew dibû dezgâkî da a îja wî çaxî didirûştin xilas dikirin, pey dirûnê jî genimê xwe dikişandin, danîn dihaştin bêderê da, bêdera xwe rast dikirin, berê zaten gêle hebû, genim rast dikirine bêderê da, gayê xwe girê didane nîrê wî 44 didane se siya da, kama wî pey girê didan, merivekî pêşiya her ga diçû yek jî ser kamê siyar dibû. Hine herêma jî cercere hebû, cercere digotîn, cercere jî, 40 'eynî mîta teka bû, notanî devê balta dirêj heştin tê da hebû, ew hestî hema isa dizivirî ser diçû dihaş ew genim hûr dikir, hinek herêma jî kam normal davîtine pey ewkê da, pey ga yek ser kamê siyar dibû, devê ga girê didan, seva ku nexwe, hine cîya seva pîs nebe, 50 rêx neke ew jî onlema wî jî dihaşe hildan da. Ew jî torbe morbe pê va girê didan, hineka jî hema bi destê xwe davîştin, 26 digo bira nav da nemîne. Ew genim hemû hûr dibû, simbêl hemû diweşiya, îja pey wê carke berav dikirin, pey beravkirinê îja didane bayê, ba dihaş, bayê bêdera digotîn, ew jî di wî wextî da, payîzê, îja didane bayê da ka wana 28 alîkî diçû genimê wan dima wira da. Genim bi sê tîştan bi kar danîn dihaştin, genimê xwe dixiştine savar, genimê xwe dixiştine d'en da, genimê xwe dixiştine ar da. Genimê ar dişûştin, ew gemara nav hemû tev diçû temîz dibû, genimê xwe 51 radixistin 'işk dikirin, genimê xwe 29 dixiştine çuwala,

devê çuwalê xwe didirûtin, wî çaxî 'erebê ga hebûn, barê 'ereba dikirin, dibirine aş da, aşê avê hebûn, aş jî beraşê wê hebûn, av dihat, binê aş da 41 'eynî notanî perwane hebûn, avê li pervanê dixist, perwane dizivirî, qawûş davêtine wê perwanê danîn davêtine wê perwanê da, dema ku ew perwane 25 dizvirî perwanê jî ew kevîr dizivirand, di hev 30 kevîrê mezin beraşê aş digotin, se aş jî sebet hebûn, genimê berdane hindirê sebetê da sebetê hema isa hindik hindik genim dihat diketê hindirê orta he kevîra da dibû ar da, yekî wira devê çuwalê digirt yekî jî ar berdidayê, paşê devê çuwalê xwe didirûtin, piştî wê arê xwe danîn malê da, arê xwe dixistine hevîr da, hevîrê xwe dixistine nan da, arê xwe dixistine mirtoxe da, arê xwe dixistine şileke da, şileke av berdidane nava arda ar 42 hinekî r'en çedikirin, berdidane se sêlê, se sêlê iha bela dibû notanî nanê sêlê çêdibû, ewa nana jî danîn dihatin rûnê nivîşk, rûnê mala digotin, ew 47 rûn dihelandin, ewa nana jî hûr hûrî dikirin dixistine nav da, ji wê re digotin şileke. Arê xwe dixistine jajerûn da, ew jinekê ku teze, 48 hemla xwe datinîn, teze nexaşbûna hemla xwe datinîn, bi taybetî jî ew jajerûn jî 43 'eynî notanî dermanekî taybet dide wan jinan, wan jinan dixar ji boy ku zû rabine ser linga da.

Genimê d'en jî ew jî ayrî didane çêkirin, genimê d'en jî genimê xwe danîn dihatin dişuştin, dixistine cûnî da, dikuştan, sadece genim dikuştan, paşê ew genimê xwe temîz dikirin hildidan, ew genimê xwe dixistine keledoş da, ew genima dixistine helise, ew genima dixistine girar, gele tiştê, pê xurek dihatine çêkirin da. Genimê savar jî ew jî ayrî dihatê çêkirin da, 32 çu min hêca anî ziman da.

Ya kayê jî 34 ka xwe jî hildidan, ka xwe jî zivistanê didane heywanê xwe, heywanên xwe pê 33 xweyî dikirin a ka xwe tendûra xwe pê vêdixistin bi kayê, nanê xwe 45 ser dip'etin, xurekê xwe ser çedikirin, debara heywanê xwe pê derdixistin, 35 ka jî sakîne bi kar dihat.

Vebêj: Tevfik Taş

Roja Ji Dayikbûnê: 1971

Rewşa Xwendinê: Lise

Cihê Berhevkinê: Navenda Çaldiranê

Berhevok: Xwarin

11 D^cEN

payîzê zevî dihaşîne dirûn da, genimê xwe danînê bêderê da, genimê xwe dikutan, didane partosê, beriya wê jî partos nebû gêle bû, gêle jî, ga girê didan gêlê da, simbilê genim li bêdera rast dikirin, nîrê ga girê didanê, ew kâm hebû kâm jî davêşîne pey nîr da, merivek jî se kâmê sîyar dibû, yek jî pêşîya ga diçû, hema isa kâm se dibir dihaşîn, heta ku ew hûr dibû, simbil diweşîyan, genim diketê 'erdê da tevî kayê dibû ka xwe didane bayê da ka alîkî diçû, genim alîkî diçû, pey wê jî danîn dihaşîn genimê xwe temîz 46 serad dikirin, didane bayê da serad dikirin, bêjîng dikirin, genimê zimhêr ayrî hildidan, genimê savarê xwe jî ayrî hildidan, ew jî danîn dihaşîn, dişûştin pey şûştinê jî dixistîne sîtila da, kuçîk daşînîn, tendûr vêdixistîn, genim dixistîne sîtila da av berdidanê genim dikeliya, pey kelandinê jî danîn genim radixistîn ber tavê , nivîn radixistîn pêşiyê 'erdê, beşanî, emenî, xalîçe derfetê berê ew bûn, naylon filan tinebûn, piştî wê ya rojekî di roja isa radixistîn heta tam 'işk dibû, ew genimê dikeliya ji wî ra 44 digotin d^cenî, wî çaxî teze hê gem bûya jê ra digo, d^cenî îja wî çaxî radixistîne ber tavê da, ber tavê ziha dibû, 'işk dibû, îja danîn dihaşîn qîzê memleket, gund berav dikirin, danîn dihaşîn dikirine cûnî da, hine cîyan cûnî hebûn, hine cîyan jî 'erd dikolan, 'erd 45 ç^cel dikirin, tiştêk radixistîne wê ç^celê da ew genim berdidane wê ç^celê, mîrkut hebûn, mîrkut jî destiyê wana nota destiyê bêra, z^cef 1 zêde dirêj nebû a serê wan jî dar bû darê qalin bû, qul kiribûn, ew destî tê da cî kiribûn, 47 tabî saxlem çêkiribûn, seva ku jê nefîstiqe jê dernekeve îja 2 wan qîzana dora wê ç^celê berav dibûn, hev ra bilin dikirin lê dixistîn, ew ya savar isa dikutan, ew qalkê savar se radibû, 36 qalkê wê se radibû, paşê jî danîn dihaşîn didane bayê da ew kapekê hemû diçû, îja danîn dihaşîn ew savarê xwe berav dikirin, dixistîne hindirê torba da, paşê îja diketîne nava gund da destar danîn dihaşîn, destar jî kevîr

bû, di hev kevîr bûn, di hev kevîrê grover bûn, ewa jî her kevîr nedibû kevîrê wî hine taybetiyê wî kevîrî hebû çaxê ew kevîr hev diçû dihaţ jê hûr nedibû, jê ranedibû, tevê savar nedibû, di hev, di jin ber destar rûdiniştin, zaten orta wê qul bû, kevîrê se qul bû, yê binî da jî şîşek hebû ortê da ew şîş wê qulê ra derbas dibû derdikete derê malê da 44 wê qulkira savar berdidane hindir da savar dihaţ dikete orta her 37 di kevîra da, wî kevîrî da jî 38 bistîk çêkiribûn, yêra destê di meriva, di meriv 39 hev ra bigrinê bizvirînin, savar berdidanê da hema isa savarê xwe hema isa dizvirandin dizvirandin, ew kevîr 40 he merva, dibir danîn dihaţin, dibir danîn dihaţin heta ku ew genim 41 isa ret dibû, genim a genim hûr dibû, dibû savar a piştî wê jî danîn dihaţin îja ewka wê hebû elega wê hebû lê dixistin , ya z^cef hûr wê elegê ra derbas dibû ewa dibû poxîn, ya dinê dibû savar, ew savarê xwe ayrî hildidan, poxîna xwe jî danîn hildidan, ew poxîn jî danîn dihaţin nava rûn da diqelandin, nava rûn da diqelandin, şekir tev dikirin sibê zû taştê pê xwurinayê da pê nan dixarin, eynî notanî mirtoxe digotin, notanî mirtoxê, mirtoxe bi ar çêdibe 43 ew tiştêkî cuda bû a savarê xwe jî hildidan, savarê xwe danîn dikelandin, savarê xwe dikirine kifte da, savar çêdikirin, savarê nîskan çêdikirin 48 pê nêvanê xwe rê dikirin, pê debara xwe dikirin.

Vebêj: Cahide Tetikçi

Roja Ji Dayikbûnê: 1956

Rewşa Xwendinê: Nexwendî

Cihê Berhevkirinê: Navenda Çaldîranê

Berhevok: Çanda Jiyana Zivistanê

12 KOSEGELÎ

Meha çile da digeriyan, yek danîn dihatin, çaw badidan hema isa ê hêtê wî, he milê wî, heğanî qefesa wî dizvirandin, 7 se çevên wî 1 ar dikirin a zar xwe ra digihîştine hev da satila xwe didane destê xwe da, nava gund digeriyan, diçûne 2 derê mala, diçûne 3 derê goma, derî dixistin, wextê bex dizan, wextê 4 pezzayînê bû ne isa? Lê wextê pezzayînê bû diçûn derê goma dixistin digo, kenawo xêr 5 bereket zêde dibe ça dibe a îja dihatin derê mala rûn didane wan da, şekir didane wan da, ar didane wan da a îja êvarê çaxê nava gund hemû digeriyan, îja diçûn 6 malekî xwe ra berav dibûn, rûnê xwe, şekirê xwe, arê xwe îja dixistine mirtoxe da îja dixarin hev bela dikirin, pere hebûya perê xwe jî hev bela dikirin, hev bela dibûn diçûne mala xwe da.

Vebêj: Mehmet Tetikçi

Roja Ji Dayikbûnê: 1960

Rewşa Xwendinê: Nexwendî

Cihê Berhevkinê: Navenda Çaldiranê

Berhevok: Lîstok

13 MELE HIRO

Di komê qasî hev çêdibûn, komek ji şeş –heft kesan çêdibû, îja komek rûdinişt, iha kom dibûn xwe didane hev, yên ku rûdiniştin yên ku ewna biparastana navê wî mele bû, mele dima ser komê, 2 hevalê wan xwe diçûn vedişartin yek ji wan jî dima kêlekê mele ji bo 3 gazî wan ke, mesela mele dûr diket wana digeriya, yanê ewnê werin zirarê bidine cûcîkê mele ya, mele wana digeriya ew ê dinê jî pê ra digeriya, lê 4 ewî gazî dikir, teralî dikir, gazî dikir digo, em hatine ber diwarê 9 mala ‘Emê, digo, em hatine qulikê mala Paşa, 10 ‘Emerîkê, carke din digot em hatine filan derê, îja ewanê dinê jî hevalê wî çûne xwe veşartine, isa xwe vedişartin. Bi gazîkirina hevalê xwe dihatin 5 xwe digihandine cûcîkê mele a li wan didan, heta mela bihata wan li cûcîkên mele didan. Lê wexta ku mele bihata destê xwe 8 li yekî wan xista 6 ew dişewûtin a dor dibû ya koma dinê, vê carê jî koma dinê dewsa wana rûdiniştin yê din diçûn xwe vedişartin.

Vebêj: Mehmet Koç

Roja Ji dayikbûnê: 1957

Rewşa Xwendinê: Nexwendî

Cihê Berhevkirinê: Navenda Çaldiranê

Berhevok: Çandin

14 ÇANDIN

Li Çaldiranê genim, genim tê çandinê, 1 yêmê heywana tê çandinê, ew e, idî tiştêkî ku were çandinê nîn e, yanî ji bo welaş sar e yanî, mevsîma wê tiştê başqe nayne, bihara wê tine payîza wê tine, nivî jî havîne yanê sakîne ye. Meha gulanê tê çandin jê re dibêjin bihare, çima ku biharê tê çandin jê ra dibêjin bihare. Ew genima ji bo wê herêmê taybet e, 3 sê meha da digihîje. Sê meha da digihîje tê dirûnê, tê xarinê. Çandina wê 4 em çakî diçînin. Meha gulanê ku 'erd ziha dibe, şobê xwe radîkin, dajon, hinek payîze dajon, ku şilî hebe bibarê 'erd nerm be payîze 5 dajon a yê din jî ku pê ra negihînin, karê wana hebe payîze ew jî biharê dajon, him dajon him diçînin, nava sê meha da avdana wî, çandina wî, rakirina wî, xarina wî sê meha da tamam dikin. payîze, zemanekî tarîgan diçandin, jê ra digotî genimek hebû jê ra digotî dusale, payîze, yanê 7 qereqilçix jê ra digotî ewa hineka diçand, ew jî niha naçînin, tarîgan jî naçînin, payîze kes naçîne.

Vebêj: Fidan Koç

Roja Ji Dayikbûnê: 1948

Rewşa Xwendinê: Nexwendî

Cihê Berhevkirinê: Navenda Çaldiranê

Berhevok: Çanda Nan Hêranê

15 AŞ

payîzê her kes wexta genimê xwe hildide, ewnê ku nan bipêjin, idî mîta berê kes nan napêje, ew nanê xwe dibin ziha dikin, çedikin, temîz dikirin, 1 qismekî wî dişuştin a ziha dikirin a heçî yê mala wan da pişkûriyê wana hebûn însanê wan merivê wan jî haîbin dişon, ziha dikirin, dibirine aş, dihêrin. Berê aşê avê hebûn, hinekî sorinê wan zêde bûn yanê 2 şevêkî heşa sibê bîs 4 çar si'eta çil-pêncî teneke nan nedihêra. Niha 3 bîs çar si'eta da di hezar teneke nan dihêrin bi aşê ceyranê. Nanê wî çaxî gele xaş bû.

Vebêj: Mehmet Çakır

Roja Ji Dayikbûnê: 1974

Rewşa Xwendinê: Dibistana Seretayî

Cihê Berhevkirinê: Navenda Çaldiranê

Berhevok: Serpêhatî

16 SERPÊHAÎ

Jiyana mabaşa me li Wanê Erdîşê Geliyê Zîlan gundê Komirê da des pê dike, di malbaşa me da bîs şeş kes hebûne, hindirê xanîkî da, malekî da bîs şeş kes hebûne. Di nav wan kesa da bavê mi bîye, dayîka wî bîye, 2 xûşka wî bîye a apekî wî bîye, hemû komayî bîs şeş kes bûne, gundê Geliyê Zîlan, Komirê da.

Ewa bûyera ku serê wê malbaşe ra derbas bîye, ça ku bavê mi me ra 87 b'es kîriye, rişmetiyê apê min î Miştâq b'es kîriye, ewna dema ku jiyana wira berdewam dike, gundekî wan da, eskerî hebîye, qereqol tê da hebîye, wî çaxî ew sûbayê

qereqolê, wî çaxî milîs hebûne wê herêmê da, bi alîkariya 4 milîsan hemûk 5 çîqa tiştê bêexlaqî hebûne hemû pêk anîne di herêmê da.

Bavê min digo, digo, mesela, rihmetiyê apê mi diha mezin bû, dihate bîra wî, digo, wê herêmê da kesekî 88 d'ewatek bikira ji kûrê xwe ra, bi alîkariya wan, agahiya milîsan didan wî ruþbeliyê dewletê, go, ewê şevê ewa bûka 89 pêşiya 'ewilî danîn dihatin, teslîmî wî ruþbeliyê dewletê dikirin, ewî ruþbeliyê ew pêk danî dihat, paşê rojekî bîya di roj bîya kêfa xwe pê derbas dikir, paşê teslîmî zavê dikir, heqa gele cara digo, hine bûk jî digo, qetil dikirin, digo, hine bûka jî digo, bixwe xwe qetil dikirin, nedihîştin ew tişt serê wan ra derbas be. Îja eva gelekî sakîne ew tişt berdewam dike.

7 rojekî rihmetiyê 8 birê kalkê mi, birê bavê bavê mi navê wî Nadir bîye, ewa hilde dibêje gele kesan da, divê eva pîslika ku serê me ra derbas dibe, divê idî jin neman evê heqa kîngê iha bedewam bike, divê rojekî idî emê van tiştê ra bêjin idî bes e. Zaten meriv boy namûsa xwe dijî, zaten namûs dest çû îro em bijîn çî ye nejin çî ye. Li vê cîhanê jîyan 111 me ra heram e, 11 qe nebe em çar bikin, em hema întiqamê van zarokê xwe bidine hildan da.

Evna 12 komekî çêdikin, wira qereqola hêca mi bes kir, diçin ser wê qereqolê da digirin. Dema di ser wê qereqolê da digirin, 90 'elîqopter alîkariyê ji ewkê ra, qereqolê ra tîne tê. Ew çaxê alîkariyê tîne tê, wira ewê qereqolê dişewûtînin, gelek ruþbeliyê wan jî tîne kuştinê. Ew 'elîqopterê dine xistinê da, lê 9 kalkê mi dibêje wan hevalê xwe da, dibêje ew eskerê li hemberî me şer nekin, wan eskeran nekujin, wana dîl bigirin, nekujin. Gelek esker hemberî vana şer nakin, evan kesana herekî eskerekî xwe ra dîl 13 digrin dînin tîne. heqakî kalikê mi jî yekî tîne tê, tîne mala xwe da qedera 14 salekî mala xwe da xwe ra dide xebatê da. Ewa hê qetliyama gelî des pê nekiribiye. 15 Berya wê ew bûyer çêdibin. Îja ew çaxê, ew qetliyama ku nîzka çêbe, kalkê mi, ez ê ku dizanim min ra gotine, birayê wana ez navê çar heva dizanim, ewnê dinê navê wana gotin jî bîra mi çûye. Navê yekî Nadir bîye, birê wan ê mezin bîye, navê yekî jî 16 Miheme bîye, bavê bavê mi, navê yekî Beşîr bîye, navê 112 yekî jî hacî bîye. Ew he çar bîra bûne. Miheme, Nadir zewicîbûne, di hev zarê Miheme hebûne, yek bavê mi bîye, yek jî xûşkeke wî hebîye, di hev jî zarê Nadir hebûne, Miştay yek jî navê qîzeke wî hebîye Gulîzer.

Rojekî ara kalkê mi, birayê wî hinekî nexaşi çêdibe, kalkê mi dixeyîde dibê ez ê mala xwe ce te bar kim, biçime ce mala xezûrê xwe. Mala xezûrê wî Zortilê bîye, Zortil jî gelî da nebîye, Zortil jî kêleka Erdîşê bîye, ketiye yalê Filistanê, yalê

Elcewazê 18 walî dikeve. Dema kû kalkê mi mala xwe bar dike gund derkeve, heywanê xwe, mala xwe hemû berav dike, ewa kalîkê min ê Nadir diçe wî çaxî yekî eqrebayê wan hebîye, ew jî mezin bîye, jê ra dibêje, dibê Mihemedê birayê mi, min ewî hinekî hev ciz kîriye, xeyidîye, mala xwe bar dike, gund derdikeve, dibê heke ti herî 107 ti wî bizvirînî, dema ewa kesa diçe, pêşiya kalkê min î Miheme, kalîkê min î Miheme son dixwe dibê e nazvirim, dibê mi son xariye, ez ê mala xwe biherim. Ewa kesa hilde dibêje kalîkê mi da dibê madem ku te 17 son xariye, tê mala xwe bibî, malê bihere, lê navmala xwe nebe, heywanê xwe nebe, here heta payîzê ce wan mala xezûrê xwe bimîne, payîzê cake mala xwe bîne, madem ku te son xariye, sev xatirê sonda te, ewa idî wira navmala wî heywan meywanê wî jê distîne, idî kalîkê mi bi jina xwe 19 di hev zarkê wî hebûne, erebê çen hev nivînê xwe dane ser tîne Zortilê da.

Têne Zortilê da de îja ew bûyera kû gelî da ew bûyera isa se qeqreqolê da girtine, ew şewûtandin çêbûye, ew hine kes hatîne kuştinê da, ew eskerek, ewî kû nava mala kalkê mi da dixebite, de xwe ra dil girtine anîne hatine, ewa eskera rojekî firsetê dibîne, direve diçe, diçe Erdîşê da, diçe Erdîşê teslîmê eskeriyê dibe. Dibê welle ew bûyera kû wî gundê kû eskerî tê da bîye, bîye, e 20 wan kesana nas dikim, tê navê kalkê mi dide, navê kalkê min î Nadir dide, navê çen hev kesê din dide, wî çaxî milîs zaten nas dikin wana, bi 3 alîkariya milîsa wan kesana digirin dibin.

Dema kû dibine Erdîşê da wira îdama wan didin, îdama wan didin, dibê 22 wun ê biherin wana bine darve kîrin da. Ê de îja wana wî çaxî dibin 91 El'ezîzê dadiliqînin, dibine El'ezîzê, ew wî çaxê diçin, tam jî ketiye wextê zivistanê da, diçin rê da bager çêdibe, idî payîz xilas dibe dikeve zivistanê, peyaftî diçin, diçin rê da bager çêdibe, 23 ewan eskerana di hev esker bûne rutbelîk se wan bîye, ewna rê da diqerisin, ewan eskerana diqerisin, ê de îja 10 kalkê mi jî di wî memleketî da jiyaye, 24 ewan sermana, 25 ewan zivistana a derfetê wî zemanî zanibîye, bi çi awayî bi kar tê. tîne carê eskerekî dide piştî xwe qasî sed- du sud mêtreyî dibe da tîne wira îja tê eskerê din dide piştî xwe hilde dibe, hema isa xwe be hev diguhêze diguhêze hetanî kû xwe digihîne gundekî, gundekî, evan eskerana xilas dike vana ji qerisandinê, idî ewî çaxî şevêkî bîye, 27 di şeva bîye wira dimînin çi dimînin, rojê pêş da hewa xaş dibe, radibin carke riya xwe berdewam dikin, heta diçine El'ezîzê da, çaxê diçine wira da, ewa her sê eskerana jê ra dibine şahid da, dibê eva kesa yê xirabîyê nebîye, eger kû xirabî bikira, dilê wî yê xirabîyê 106 hebîya, ewî zaten em qerisî bûn, yê em di rê da bihiştî, bireviya biça xilas bîya, bi rastî jî eva kesa bû sebebê jiyana me, ji

wê sermayê da xilaskirinê, eger em niha dijîn saya serê wî kesî ye. Li ser şahidaþiya wan her 28 sê eskera wî çaxî sawcî daliqandina wana qebûl naþe, betal diþe, 92 °efû diþe. Wê derê káلكê mi °efû diþe.

káلكê mi idî dizivire þe, þe Komirê da idî ew zivistan diþede diþeve biharê, ew 29 qetliyam des þê diþe, zaten bavê min a apê min î Miþtaq digo, go, gava ku se gunda da digirtin, go, hêsîrê 30 çar –þênc gunda komî hev dikirin, go, îja se dîwarê gelî ewa 113 sîlahê giran, go, þêk anîbûn haþîbûn, go, de îja 31 masek danîbûn qasî sed- du sud mêtreyî dûr danîbûn, go, ser masê hine kaþiz danîbûn, go, digo, birevin kê we 32 kaþizekî xwe ra xilas bîke, em ê wana °efû bîkin, go, îja ewî çaxî ku hêsîrê wan gundana zar, jin, mezin, þiçûk xwe li hev 33 ras dikirin, berê xwe didane wan masa ku direviyan, 34 go îja bi ew sîlahê ku se dîwarê 35 wan çiya dema didane xebitandinê, digo, li wan direþandin, go, ça ku bîþer diþeve nava gîhê gîhê 122 didirû, go, °eynî isa go, cendekê însana se hev da diket. Go, dema ku diket xilas dibû go, singî 36 serê tivingan dixiþtin go, îja ceseda dixiþtin 37 cesed werdigerandin, 108 çîkanê saþ hene tinene.

De îja ewê qetliyamê ewê bûyerê sakîne berdewam kir, zaten mala káلكê mi wira nebîye wî çaxî, mala bavê bavê mi, Zortilê bîye. De îja belengazî wî çaxî jî gundê xwe çûye zaten navmala xwe nebîribû, þeywanê xwe nebîribû, lê káلكê min î Nadir di roja binê cendeka da saþ mabû. Wî çaxî merivek wira bîye ew jî birîndar bîye, birîna wî normal bîye, divê þi herî agahî bidî filankesê bira were mi 39 xilas ke, 40 e nemrime e saþim, þe cavê dide káلكê mi dema káلكê mi diþe ewqas cendeka werdigerîne nabîne. Káلكê mi dizvire þe gund da, lê di wê malbatê da kesê ku filitin nehaþine qetilkirinê da þeþ kes, þeþ kes filitin. Ji wan þeþ kesana bavê mi, na þeyþ kes, bavê mi xûþkeke xwe, Miþtaqê apê mi xûþkeke xwe di hev jî apê wana, yeþ 93 °emrê wî þanzde salî bû, yeþ °emrê wî þejde salî bû, diya wana, diya wan jî nehate qetil kirin wî çaxî, ewa jî wî çaxî saþ filitî.

Mala káلكê mi zaten Zortilê da bîye, 42 þîrka mi go, þîrka mi zaten vê axirîyê, vê dawiyê çû emrê Xwedê da, go, káلكê þe 86 þe ro þe ro diþû go, nan dida dasê da go, wê rojê go, çû hema nîzka taþtê go, zivirî go, hat. Go, dema ku zivirî hat go, e þêþva çûm go, mi go, þi çima haþî, go, ez îro hinekî nesax im, bedena min dêþe, ez níkarim bixebîþim, go, mi jî teze de berê þendûr sibê zû dadidan serê sibê, xarin marina wan çî hebîya se çêdikir, go, mi jî þendûr teze sar kiribû, go, hat go, hema devê þendûrê go, mi cilek raxiþ go, qetêke cilê raxiþe binê wî qetêk mi avêþe ser da go, xwe devê þendûrê da dirêj kir, go, ane gorî si°etek navberê ra derbas bû nebû mi

dêna xwe dayê eskerî hate gund da, go, eskerî hate gund da, go, keçe nava gund go, haține derê mala me da, go, zaten xanî yê me nebû, go, pîrtî koxîkêk bû go, yê mala bavê mi bû, go, ewna dabûne me, go, xwe ra tê da dijîyan, go, hațin ketîne hindirê koxîkê me da a go, koxîk hemû li hev xistin, go, serûbinê hev kîrin, go, kâlikê mi jî wira ber devê tendûrê razabû, go, go, ev kê ye go, mi go, malxwê mala min e, mêrê min e, go, go, çima xwe vira dirêj kîriye, go, min go, welle 114 hal mesele iha nexaş bîye, çûye nan bide dasê da, paletiyê dîke, diçe dixebite ji xelqê ra, idî hinekî 94 ‘acizîya wî zêde bîye, lêxistiyê hațiye, vira xwe dirêj kîriye, razaye. Go, derketin çûn, go, derketine derê malê, lê go, 115 Sidîqê heso bi wan ra bû, go, Sidîqê heso guhê Dewrêş Begê da xeber da, go, Dewrêş Begê şixwe ew qetliyama Gelîyê Zilan bi destê wî bû pêk hat, go, guhê wî da xeber da, go, cake paşve zivirîn, go, cake hațin ketîne kox da, hema kâlkê mi 43 nava wê berkê da dedixin, dedixin derê malê da, îja pîrka mi bi rastî jî yanê merivê pîrka mi bidîtana pîrka mi 44 cîkî dinê xeberda te vira guh bidayê 45 te bihar nedikir ku jin e 46 ewqa dengê mêra jê dihat, yanê yeke isa bi hêz bû, ser xwe bû. 47 Go, e çûm go, mi ligê Sidîqê heso xiste devê xwe da, go, mi go, Sidîq bide xatirê Xwedê, tê Mihemedê mêrê mi bi ku da biherî, wun ê biherin bikujin, evê bêbextiyê nekî, zaten malbat hemû hatine qetil kîrin da, kes nema nava malbatê da. Go, hema tiştê hilda gote mi, go, go, Nurê, navê pîrka mi Nûrê bû, go, go, mi nanê mala 96 ‘Evdalê Beko z’ef xariye, e ti zemanî wan ra bêbextiyê nakim. Go, dema ku ew kelîme xeber da, devê wî ra derket, go, baweriya min pê hat, go, baweriya mi pê hat, go, hildan birin, go, 126 nîzka mexrebê bû, go, pez hat, dewar hat, go, şivan hațin, go, go, welle filankes wê derê hanê bin gund kuştine, biçin cenazeyê wî binin werin, go, nizam ‘erebeke ga bû çi bû go, ya cînara me hilda, go, em çûn me dêna xwe dayê da hê sax e, gule mile bernedanê, 48 tenê bi dara kuşane, go, me avîte se ‘erebê, go, me hilda anî haçe malê da, go, êvarê heta si’et dazdehê şevê go, hema isa hilqinî dihatê vedireşîya, go, 116 taseke me ya herî hebû go, me dida ber devê wî go, hema isa goşt devê wî ra davît a go, heta si’et dazdeh yekê şevê wan çaxa bû go, jiyana xwe dest da, go, çû emrê Xwedê da.

Îja ewna li wira êtîm man, îja eqrebeyê wan 127 li Ebexê hebûn, Miştaqê apê mi di hev jî apê wana sax filiîbûn, diya wana mêr kîrin, diya 49 her dîka jî mêr kiribûn. De îja zarê wana êtîm bûn, wî çaxî derfetê wana tinebûn, zarê xwe bi rê biherin, 50 mecbûr man mêr kîrin a diya Miştaqê apê mi 117 yekî hemoyî kir, navê wî Reşîdê Rostem bû. Diya bavê mi jî 109 yekî çêloyî kir, navê wî hecî hekîm bû, li Erdîşê. Lê eqrebayekî me hebû, ew jî nîzkî kâlkê mi bû, navê wî Biro bû, Biroyê

Bekirî digotinê da. Biro diçe ji boy mîrata wana, ji boy malê bavê wana maye, dibê ez wan zara, êtîma bibime ce xwe da, zarê me ne kenawo, de îja wê demê da mala kâlkê mi z^cef zengîn bûne, heywanê wan hebûne, dewarê wan hebûne, sermaye destê wan da hebûye.

Diçe malê wana hemû top dîke, hilde tîne ce xwe, dema ku diçe tîne tê, lê bavê mi nayê, bavê mi piçûk bîye ya, z^cef piçûk bîye, pîrika min nikaribîye ji xwe biqetîne. Miştaqê apê min, ew xûşka wî ye Gulîzer, her di apê wî va hilde tîne Ebexê da, tîne Çaldiranê da, 128 Bayîzdaşa. Wî çaxî ewna jî li ewkê dijîn, li Êgekumetê gundê wan li wira bûne. tîne tê ce xwe da de Miştaqê apê mi go, çar- pênc salî bû, de Miştaqê apê mi, go, zarê kâlkê min î Nadir ê kûrîn yek tenê bû, go, z^cef delalî xweyî kiribûn, go, nedihîştin Miştaq ^cerdê bigere, go, anîbûn haţibûn, eva serçoka wî ra hirî çêkiribûn, go, bira 51 çokê Miştaq ^cerdê nekeve, se negere, 118 çokê Miştaq neherişe, isa delalî xweyî kiribûn. Dema ku Biro hilde tîne ce xwe da, Biro hilde dîke bexbanê xwe da. Malê bavê wana hemû tîne dixwe ewî jî dîke bexbanê xwe da.

Rojekî yekî eqrebayê me hebû ew jî 129 qaçaş bû, ew jî çiya digeriya, navê wî Şebab Axa digotin, Şebabê Mişto, de Miştaqê apê mi tîk tenêka, gomê Îsoyê Ūso dibêjin nava Kirê tendûrekê da tenê wira be bexan dimîne, go, e wira be bexa bûm, go, mi dêna xwe dayê siyarek haţ, siyarê hespekî haţ, go, haţ 52 haţ ce mi da, go, goşê mi xarzi tî ra bereket be, go, mi jî go, 97 serç^cevan xalo, go, e jî piçûk bûm, heft salî heşt salî bûm. Go, gote mi xarzi tî xelkê ku derê yî, go, mi go, e xelkê Êgekumetê me, go, hilda goşê mi kûrê mi, e pîrsa yekî ji tî bikim tî naz bikî, go, mi go, xalo bêje belkî mi naz kir, go, gote mi da tî Miştaq naz dikî, yekî êtîm e, xelkê Erdîşê ye anîne haţine vira. Go, mi go, xalo welle Miştaq ez im. Go, hema ça mi go, Miştaq ez im, go, hema mi ça go, ez im, go, xwe se pişta hespê avête ^cerdê da, go, ez 53 hemêz kirim, go, se mi da giriya go, isa giriya isa giriya, go, hespê siyar bû ez avêtime terkiya xwe da. Go, mi go, xalo tî ça bikî, go, go, em diçin, go, tî vira çî îşî dikî go, mi go, xalo ez be bexa me. Go, da xebera go, ezê 54 gora bavê Biro nim. Ez diçime Êgekumetê sonda bêfîtar, e heţa Biro Êgekumetê 56 nekujim denakevim. Biro malê bavê tî 58 bîne were hemûkî bixwe, tî jî bîke bexbanê xwe, go, mi go, xalo bide xatirê Xwedê bexê min ê gurê bixwin. Serê vî çiyayî nava çiyayî tendûrekê tî ça dikî. Go, mi kir nekîr go, tiştêk pê neda bawerkirinê da.

Go, ez hildam de wî çaxî gundê Êgekumetê gundê niha wir da nebîye, ew ^cAhme ker dibêjin, tanga 130 Şêx Cindî, wî çaxî gund wira bûne. Zomê wana wira danîne yê êlê. Go, hema ça de îja Şebab Axa jî go, firar bû serê çiya bû, qaçaş bû, go,

de îja hêzeke wî hebû, hêzeke wî ye xurç hebû, go, her kes jê diçirsiya, go, 98 dema b^cesa Şebab Axa dibû, go, jin nedisekinîn nava zomê da, go, hemû direvîn 123 herekî alîkî diçûn, go, ça hespê Şebab wira derdikeve tê, siyarê hespê, go, jin ç^cev pê ketin, her jinekî alîkî çû, tûr tûrî bûn herekî keçe hindirê konekî da, go, hema ça xwe da orta zomê da, go, da xebera, go, gazî Biro kîn, ez ê gora bavê Biro nim, ez ê îro Biro bikujim. Biro rabe malê bavê Miştaq bîne were bixwe hemûkî 57 talan ke, bîne were 59 Miştaq jî bike be bexa, go, jina Biro haç, go, ber geriya, go, kir nekir Şebab Axa îqna nebû, lê go, Biro wê demê da 60 wira nîne a digo, Biro çûye gundekî dinê da, çûye Şerebxan da.

Go, nava Bekira da jî Şebab Axa tenê nav Êgekumtê da go, gotîna hesenê Beko denediket, de Biro jî kûrê Beko bîye, kalkê bavê mi jî kûrê Beko bîye, hesen jî kûrê Beko bîye, evna birê hev bûne. Go, jina Biro dibê heke hûn cavê bidine hesen da hêcîk Biro ji Şerebxan nehatîye, na lo go, Biro çibû Seregola da, go, 61 hesen çibû Şerebxan. Go, cavê bidine hesen bira hesen Şerebxan herin bînin werin, hesen neyê, Şebab Axa son xariye heta ku Biro vira nekuje vira denakeve. Go, yekî siyarekî hespekî kirin, go, Şebab Axa jî orta zomê da rûniştîye se kevirekî dibê hetakî Biro neyê e Biro nekujim, e vira denakevim, go, cav dane hesen da go, hesen wira bi hespê lê da lê xist haç.

Go, zarekî şandin Seregola go, go, bêjne Biro da dibe Biro haja wî pê tinebe were vira da go, bira Biro neyê vira. Biro bira yan here Nanparêz yan jî here Bazîdaşa, bira neyê gund da, si^ceta kû were gund da Şebabê lêxe Biro bikuje. Go, hesen haç, lê go, Şebab Axa gotîna hesen denediket, go, be geriya go, kûrê mi ça bîye filan, go, hal mesele aha, go, hema tiştê kû destê wan da ma, go, jina Biro hilda gote Şebab Axa da, go, go, Şebab ew bexê kû Miştaq diçine ber yê me nîn in kû, bexê Miştaq bixwe ne. Malê bavê wî me aniye hatîye, 62 be bexê xwe ye a go, bi wî awayî go, ewkê dane îqna kirin da, Şebab Axa. Go, Şebab Axa ji zomê derket lêxist çû.

De îja her di apê wî jî wira mabûn, yekî 41 şazde salî bû, yekî 66 heyjde salî bû, eva Mamedê heso go, ew jî ji 99 eşîreke din bîye, ewna jî wî çaxî milîs bûne, milîsê dewletê bûne, eynî notanî ça îspiyonciyê niha hene, eynî wana. Evna diçin îxbarê dikin ça dikin, divê evna Beşîr, hacî ewna her di jî apê bavê mi bûne. Dibê evna xelkê Gelî ne, xelkê siyasetê ne, xelkê Gelîyê Zîlanê ne, ser îxbara wana, dewlet tê wan her dîka digire, dema kû tê van digire, yekî eqrebayê wan jî hebîye, navê wî jî Celîl bîye, Celîl jî birê Çerkez bîye, wî çaxî 63 nehya midirîk hebîye, nehya midirî gazî Biro dike, dibê Biro dibê tê pênc mecîdiya bidî min da, di mecîdî

nîv jî bira Çerkez bide min, seva birê xwe, dibê ezê vana, navê wana biheşibînim, evna yê herine sirgûnê da, ez ê navê wana biheşibînim bira ewna neçin.

De vê dawiyê jina Biro hilde dibêje, jina Biro dibê dema kû ew nehya midirî ew tişt ji Biro ra goşîye, mi hilda goşîye Biro, mi goşîye Biro pênc mecîdîya bide bira qe hacî, Beşîr neçine sirgûnê da. Dibê Biro hilda goşîye mi da, navê jina wî jî Gulê bîye, Gozê bîye Gozê, dibê ez dema kû hacî, Beşîr neçin, hacî, Beşîr mezin in, 64 °emrê yekî şazde sal e, 65 °emrê yekî heyjde sal e a îsal pê ra ewna para bavê xwe ji min distînin. Lê Miştaq, zar e, Sidîq zar e, zaten Sidîq vira nîn e, Sidîq pîçûk e, destê cîya xwe da ne, ce cîya xwe ye. Evana heta 67 mezin bin, evna idî nikarin malê bavê xwe ji min bistînin, ya baş em hacî, Beşîr vira bişînin bira lêxin herin. Wî çaxê kû ew nehya midirî pênc mecîdîya dixaze evna nadin, Çerkez jî nade, van her dîka dibêjin em ê bişînin, ew nehya midirî isa hêrs dibe, hilde dibêje, ewî sûbayî yê kû wana bihere, wan eskerê kû wana bihere, dibê wun isa vana bi ezîyet biherin kû, yanê bi awakî z°ef nebaş wun ê wana biherin, wun ê îşkencê bidine wana, rê da wun ê heqaretê wana bikî, isa biherin. Go, derbihar bû, go, wextê kurşa bû, go, de çem cemed girtîbû, çemê nava Çaldiranê, ji Êgekumetê heta fîne Çaldiranê, go, çem cemed girtîbû, go, em çem derbas kîrin, go, de em 68 çen cara, go, em çar cara go, em cemedê derbasî walî kîrin, cake derbasî valî kîrin, go, hema isa 69 xûna van çokê me, go, 110 çermê ser hate birîn da, go, gihîşte hestîyan da, hema isa xûna me se cemedê hema isa kişîya çû.

Îja ew her kesena dişîne ewkê da, dişîne Edenê da, lê jiyana wana Edenê ez pê agahî nebûm, salek berê niha 107 e çûme Balikesîrê, çûyîna min e Balikesîrê jî iha çêbû, eva dema kû diçin sirgûnê Edenê dikî, Edenê wira gelek zordarî serê wan ra derbas dibe, gele heqaret wana tene kîrin gele îşkence li wan tê kîrin da, wira jî çar sala bîye, pênc sala bîye, isa bihar dikim me ra isa haşîye goşin da, 119 hebsê da dimînin, 70 piştî hebsê wira sirgûnê Balikesîrê dikî, dimîne heta kû salê heftêyî da, idî agahiyê me ji wana hildan, xelqê ce me diçûne wan dera dixebitîn, têkiliyê wan hev ra çêbûn, têkilî jî ewilî jî di vir da des pê dîke, ew kesê kû îxbara kalkê mi kîr, sirgûnê Edenê kîrin, nebîyê wî ya, hecî Mizefer jê ra dibêjin, ew şehirê kû kalkê mi tê da dijî 71 navçeke wê hebîye, navê wê Havra bîye, kalkê mi wira dikaneke wî hebîye, eva Musa jî wira esker bîye, Mûsa rojekî derdikeve îzna çarsiyê da, diçe dêna xwe didê, diçe dikaneke xwe ra tişt mişta bistîne dêna xwe dide 124 resma apê min î Miştaq wira darda kîrî bîye dikanê da, hema isa ber resmê disekine zûr dimîne dêna xwe didê da, eva kalkê mi radibe se xwe da kalkê min î hacî, radibe se xwe da, hilde

dibêjê, dibê lawê mi ti çima resmê dinêrî, dibêje aþo welle 72 eqrabekî me heye, rengê wî dide, dibê kûrê mi ti ji ku derê yî, dibê, e ji Wanê me, dema kû dibê e ji Wanê me idî kâlkê mi nabêje ti kê yî, çî yî.

De îja eva kesa 79 eskerya xwe mala kâlkê mi da debas dike. kâlkê mi diçe se mala xwe jê ra kaizekî çêdike, rojê îna si^cet pênca da ji nava eskeryê dedixe tîne mala xwe da. rojê yeksemê jî si^cet pênca dibe teslîmî eskerya wî dike. heftê da di roja mala wî da dimîne. 131 Yekî xelqê Axiriyê ew jî ce wî esker bîye. Ew jî 100 mi^celim bîye, sûbay olarax eskeryê dike. De îja dema Mizefer diçe mala kâlkê mi tê. Ewê xelkê Agiriyê 101 navê wî M^cemûd e, paşava wî jî Mûrad e, ew jî pê ra diçe tê. Diçe mala kâlkê mi, di hev qîzê kâlkê mi hebûne. Ew qîza wî ye mezin, Mizefer hilde dibêje wî M^cemûdî da, ew mi^celim, dibê M^cemud, heke ti h^ciz bikî, emê qîza hacî te ra bixazin. Idî wi ra têkiliya xwe qîzikê jî çêdike. Ji kâlkê mi ra bes dikin. Dibêjine kâlkê mi da. kâlkê mi dibêje ez ê qîza xwe bidime te. Yalnız bi vî şertî ez ê bidime te da. Divê malbaþa mi hemû hatine qetelkîrin da. têkiliya me jî hev quþ bîye. ti xelqê Axiriyê yî, xelqê Qerekilîsê yî. Ez ji ber vê yekê qîza xwe didime te. Ji boy kû têkiliya qîza mi ya malbaþa min e, wira biraziyê min e, wira ji hev quþ nebin, ji ber wê ez ê qîza xwe bidime te. ti xelqê Axiriyê yî, nêzkî wan î, wun hev 21 naz dikin, seva têkilya ewladê mi, yê biraziyê mi ji hev quþ nebin, hev naz bikin, pêþda hev xwedî derkevin. Îja salê heftê da, riþmetiyê apê min î Miþtaq diçe wira da. Birayê mi jî xwe ra hilda bir. Birayê min tahir. Zaten niha, jiyana me da gelek tiþtên taybet hene. Ji wana yek jî, niha ez birayê xwe, em birê hev in, 76 kûrê bavekî, 75 kûrê dêkî ne. paþnavê me yek nîn e. Bavê mi, di hev kûrê wî çêbûn, çar hev jî qîzê wî çêbûn. her qîzê wî jiyana xwe dest dan. Çar hev niha li jyanê ne. Îja ewa çar çêbû, dema kû gundê wana isa ew bûyer ser da hat, Miþtaqê apê mi hate Ebexê da li wira ma. Ê paþnavê malbaþa wana Kûral bîye. Bavê mi jî wira tenê maye, zar bîye, piçûk bîye, mezin dibe. 77 Salê çilî da diçe paþnava xwe dike Çakir. Ma vê dawiyê da, idî bavê mi, mêrê kû pîrika mi xastiye 102 hev ^caciz dikin.

Bavê mi wî çaxî ^cerebe hebûne, ^cerebê ga, xoy dînin Çaldiranê, Bazîdaþa. rojekî tê Çaldiranê da, wira ew yek nasiya xwe didine hev. Dibê welle eqrebayê te jî vira hene. Dibê kê ne? Dibê Miþtaq, kûrapê te yê helal. Dibê ti dikarî nasiya me bidî hev da. Ser wê diçe nasiya xwe dine hev, wira hev dibînin. 120 kûrapê wî yê helal, kûrê birê bavê wî. Arê ra 78 dem debas dibe, mi çar hêca b^ces kir, mi go, ew mêrê ciya xwe hinekî ara wan da nexaþî çêdibe. Bavê mi jê ^caciz dibe, radibe lê dixê tê Ebexê da. Lê beriya wê bavê mi dizewûce. tînin tînin ji xûþka bavê mi, ji bavê mi ra

dixine berdêlî. Xûşka apê min î Miştaq jî ji apê min î Miştaq ra dixine berdêlî. Diya mi jî jina apê min î Miştaq her di xûşkê hev bûn. Îja gava zarê apê min î Miştaq tinebûn, apê min î Miştaq anî haq, birayê mi se xwe qeyd kir. paşnavê me jî hev nagirin.

Apê min î Miştaq wî çaxî çû Balikesîrê da, çû wan apê xwe bibîne, birayê mi jî xwe ra dibe. Diçe wira îja tarîxeke teze jî, tarîxeke cuda jî serê wan her birayê wî yê dîn ra debas dibe. Ew he birayên sirgûn bûne ya. Ew, ew çi bîye? Ewna wî çaxî genc bûne. Çûne sirgûnê da pênc sala zaten hebsê da mane. hebsê deketîne wira sirgûnê Balikesîrê kirine. Edenê hebs debas kirine, şandine Balikesîrê. Wira jî gundek hebîye, navê wî Çamlibel e. 125 Textekoy jê ra dibêjin. Îja birayê wî yê piçûk eskerî nekiriye. Birayê wî yê mezin eskeriya xwe dikê, yê piçûk eskeriyê nake. Dem sera debas dibe, rojekî pê dihisin ku eskerî nekiriye. Ê tabî ew çaxî çûne wira, te di sermayekî wan hebûye, 'erse dane wan da, cî dane wan da, 132 baxê zeytûna dane wan da. Zevî xwe ra şandine. Îja wî çaxî eskerî 121 pê dihise, eskerî nekiriye, dibin davêjine hebsê da. Eva birayê yê mezin diçe elima birayê xwe dide. Keşîye hebsê da elima wî dide. Dibê hema ez ê elima wî bidim, 'erdê wî hemû mi ra dimîne. Zarê wî jî tinebûne. Idî çîqa hebsê da dimîne nizanîm. Dema ku hebsê derdikeve, tê dêna xwe didê, diçe kê derê da qirûmê dewletê da, hacî diye kesek tine. hacî miriye. Yaw dibê e sax im, heqa niha hebsê da bûm, hebsê deketim, mi çûye eskerya xwe kiriye hatime, çakîne ez mirime. Dibê welle elima te dane. Kê elima mi daye. Dibê welle birayê te daye. Bira te çîma elima mi daye? Ew birê xwe wira dikevîne pêşîra hev. Ew jî isa hêrs dibe, dibê heqa dinya xaş be, e nebêjim birê mi heye.

Salê heftêyî da rihmetiyê apê mi î Miştaq birayê mi va çûne wira da. Wî çaxî go, her da hev ra xeber nedidan. Îja ew Beşîr, zarê wî qe çênebûn. Yê Beşîr kurekî wî çêdibe, zarka wî diçe 103 devê b'erê da, ewa zarê wir tînin wî dixine avê dixeniqînin. Dibê bira ziryeşa wî çênebe. Yê hacî di hev qîzê wî hebûne. Qîzeke xwe daye ewî xelkê Axiriyê, mi hêca b'es kir ya. Îja Beşîr hilde dibêje apê min î Miştaq da, dibê Miştaq dibê zarê te tinene, dibê yê we di hev zarê we yê kurîn hene, wun ê 81 yekî bine me em ê se xwe 82 qeyd kîn. Îja çaxî apê min î Miştaq 'aciz dibe, hêrs dibe. Ya dibê Xwedê ji te razî be, dibê Beşîr, hacî birê te ye, hova kêlekê te ye. heqa tî zarê me se xwe qeyd dikî, qîzê birê te hene. Qîzeke birê xwe qeyd kê. Zaten dewletê koka mala bavê we dexist. hejydeh kes haqê qetilkirinê da. Wun jî jê filitîn haşîne derketîne nava xelkê da, kesî me tinebû. Wun her bira bûn. te çîma bêbextî birê xwe ra kir. Îja dikê nake apê mi ewk nabe, îqna nabe.

Apê mi lêxist haq. Lê meytûbên wan me ra dihatin, me meytûb wan ra dişand. Carna tişt mişt dixastin, me wan ra dişandin. Agahiyê me ji hev qut bûn, heqa ku vê dawiyê, neh-deh sal beriya niha, tabî ku eqrebayê me gava ku diçûna 83 wan dera, ne kesî digote wan her qîzan eqrebeyên we hene li Wanê. Me zanibû, mi zanibû gelek cara jî ez lê geriyam, ê ti derfetê me tinebû, ez 48 agahîkî bistînim ku adresên wan ku hene. E gelek se xebitîm, heqa ku ez dema rêvebirê partiyê bûm, wekîlê me, mi ji wan ra anî ziman da, mi go, wun dikarin onergeyekî bine meclîsê da seva ev tiştana werine rojevê. Lê kesî guh nedayê.

